

## Rengê parastinê; şînok

Li gorî baweriyên Mezopotamyayê dayik ji bo parastina zarokên xwe yên nû hatine dinê, ji xirabî û îblîsan biparêzin nivîştek şîn ku dişibiya rengê çavên xwedawend Îştarê bi kar dianî. Baweriya şînok ku xwedî dîrokeke kevnar e... *R.2*



## Çîroka Qeraşê Beraşan

Çi hewiye çi tunewiye, rîvîk û qeraşik hewiye. Rûkê rîvi qerêş ra diwê, were am ta bi kaçika paşê ve bizewicînin! Qeraş diwê, halê me li ûrtê ye, em li ku kaçika paşê li ku! Rîvi qerêş ra diwê, wî îşî ti mi ra bihêle! Qeraş diwê temam!.. *Sadiye Eser / R.5*



## Neyartiya li çandê

Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) di dîroka kurdan de xwedî cihekî girîng e û heta niha gelek hunermend gihandine. NÇM li hemberî zextan li ser pêya maye û îro jî neyarên çand û hunerê dixwazin xebatên vê saziyê asteng bikin... *R.11*


Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

24-30 Tebax 2020
Hejmar: 36
Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org


# Êşê girantir dikin

Li Êlihê çawişê pispor Mûsa Orhan tecawizî jina bi navê Î.E kir. Ji bo leşkerê tirk serlêdana sûc hat kirin lê tu tiştek nehat kirin. Î. E ya nameyek nivîsand û întîxar kir demek şûnde li nexweşxaneyê dema tedawî dibû mir. Piştî ku Î. E li nexweşxaneyê mir, leşkerê tirk hat girtin. Rayedarên dewleta tirk nehiştin kesek beşdarî merasîma cenaze bibe û cenaze di saetên nîvê şevê de hat definkirin û êşa malbatê girantir kirin. Wezîrê karê hundir di axaftina xwe de tecawizkar parast... *RÛPEL - 3*



**Kam çira çawişê pisporî şevekneno!** Kamo / RÛPEL - 9

## Nameya (xwe) kuştinê


Gelo we qet nameyên beriya xwekuştinê xwendine? Li gorî lêkolînan ev name demeke kin beriya xwekuştinê tên nivîsandin û derûniya kesa/ê xwekuştî bi awayekî tazî û balkêş didin der. Di nameyan de bi giranî mijarên wek "lêborîna xwe xwestin/şermkirin", "barê giran a jiyanê" û "bêhêvîtî/wateya jiyanê windakirin" tên destgirtin. Dîsa li gorî lêkolînan di xwekuştinên kesên ciwan de herî zêde jinên ciwan name li dû xwe dihêlin. Û yên di temen mezin de giranî mêr name dinivisînin...
*Munewer Azîzoglu Bazan / R.2*

## Microsoftê kurdî lê zêde kir

Her çiqas li Kurdistanê ji aliyê dewletên ku kurd di bin serweriya wan de, dijîn zimanê kurdî bê astengkirin jî di qada navneteweyî de ji bo zimanê kurdî xebatên girîng tên kirin. Kompaniya Microsoftê ya Amerîkayê ku kompaniyeke mezin a teknolojiyê ya li tevahiya cîhanê ye, her du zaravên sereke yên zimanê kurdî (kurmancî û soranî) li lîsteya xwe ya zimanên wergerê zêde kir.... *R.3*

# Topuz: Kurdî her di dilê min de bû

Alî Duran Topuz bi nasnameya xwe ya rojnamegeriya tirkî tê nasîn lê belê herî dawî pirtûka bi navê 'Rû û Kûr' derket pêşberî xwînerên kurd. Topuz bi kurdiyeke resen a Qoçgiriyê pirtûk nivîsandiye.. Topuz di pirtûka xwe de bi gelemperî li ser mijarên komkujiya ermenan, bûyerên Qoçgiriyê, Komkujiya Dêrsimê û çîrokên ku di nav civaka wî de bûne sembol, bi awayekî felsefî vegotiye. Topuz ji rojnameya me re qala çîroka xwe û nivîsandina xwe ya kurdî kir. Têkiliya Topuz û kurdî ji zaroktiya wî ve hebûye û dibêjê ku her tim di mala wan û jiyana wî de kurdî hebûye...
*Zozan Yaşar nivîsand / RÛPEL - 4*



## Morîka xewê

Destaneke gelerî a almanan heye bi navê "Siebenschläfer" e, ango heftxewok. Li gor wê heger di 27'ê meha hizîranê de baran bibare dê heft heftiyan li ser hev baran bibare. Girêdana vê destanê bi çîroka heftxewokên efsanewî yên şikefta Ephesusê re heye. Ehlên şikeftê li gor baweriya misilmaniyê, 27'ê hezîrana 446'an a piştî zayîna Îsa pêxember her heft lehengên şikeftê piştî razana "195" salan an "309" salan li gor di Quranê de... *Ciwan Qado / R. 8*



1996'nın penceresinden

## Tiştekî nû nabêjin

...lewre di gelek hevpeyvînan de tişta ku rastî wê têm ev e; çawan dikarin gilîgotinên evqas 'bêwate' û bi ser de jî pelepûç bînin ba hev!?
Tirkbûna we li we pîroz be!
Spas, lê ez ê venexwim!... *Şener Ozmen / R - 11*

## Penaber bi rojan dimeşin

Bi salan e ji welatên mîna Afganistan, Pakistan û Ozbekistanê mirov ji ber xîzaniyê terka welatê xwe dikin û berê xwe didin welatên rojava. Li gorî angaştên penaberan ji bilî rêyên qaçax, ji deriyên sînor ên di navbera Tirkiye û Îranê re jî bi hêsanî derbasî Tirkiyeyê dibin. Ji ber ku bi rojan dimeşin, binê piyên wan werimîne û av girtine. Weke rojnameya Xwebûnê me xwe gihand penaberên li otogara Amedê li hev kom bûne... *R - 3*

## Hilbijartinên Amerîkayê û kurd!

Piştî qeyraneke mezin a cîhanî 'zilhêzê cîhanê' Amerîka hilbijartinê pêk tîne. Amerîka di cîhana bûyî du enî de, yek ji serkêşê vê pergala qeyranî ya dewletger e. Lewre hatiye wê rewşê ku gaveke wî ya biçûk jî cîhanê eleqedar dike. Êdî cudahiya siyaseta hundir û derve ya Amerîkayê nemaye...
*Mem Avba / R.6*



# Rengê parastinê; şînok

Navenda Nûçeyan

**Li gorî baweriyên Mezopotamyayê dayik ji bo zarokên xwe yên nû hatine dinê ji xirabiyan û îblîsan biparêzin, nivişteke şîn ku dişibe çavên rengşînok ên xwedawend Îştarê bi kar dianîn**

Di roja me ya îro de di nav gelek civakan de bi taybetî jî di nav jinan de baweriyên gelek xweş ên xwe dispêrên baweriya xwedawendan hene. Yek ji wan baweriyan jî şînok e.

Baweriya şînokê ku xwedî dîrokeke kevnar e û di nav jinan de bêyî ku bê zanîn ka şekl û rengê wê xwe dispêre kîjan rastiyê, gelek zêde ye.

Li gorî tê bawerkirin şînok rêbazeke xweparastina ji xirabiyan e. Li gorî baweriyê kesên şînok pêve be tu xirabî nêzî wan nabe. Bi taybetî ev bawerî di parastina zarokan de xwe dide der. Dayik ji bo parastina zarokên xwe yên hatine dinê şînokekê bi wan ve dikin û bi vî awayî zarokên xwe diparêzin.

Ev bawerî di gelek çand û olan de heye. Bi gelemperî şiklê şînokan dişibe çavan. Li gorî baweriyê mirov bi çavên xwe cîhanê nas dike û çav çavkaniya destpêka derketina her cure fikrên xirab û baş tê qebûlkirin. Ji ber vê yekê ji bo parastina ji çavan şînok tê bikaranîn. Jixwe di dema me ya niha de, hema bêje di hemû malan de şînok hene.

**Dîroka hezaran salan**

Li gorî lêkolînên hatine kirin baweriya şînokê xwe dispêre 3 hezar 300 sal Beriya Zayînê (B. Z.) û li kolanên Tell Berakê ku yek ji bajarên herî kevn ê Mezopotamyayê ye û niha bi ser bajarê Hesekê ve ye, şînok hatine dîtin. Şînokên di wan lêkolînan de hatine dîtin naşibin şînokên dema me ya niha.

Jixwe mirov dema bala xwe dide wêneyên li ser dîwaran hatine çêkirin, dibîne ku gelek şiklên çav ên bi rengê şîn hene. Di her serdem û şaristaniyê de şikl û çîroka çavan cuda ye lê dawiya dawîn hemû tişt tê li ser parastinê disekine. Bê îstîsna, di her serdem û şaristaniyê de çav xwedî wateya parastinê ye.

**Rengê şîn**

Şînok rengê xwe yê şîn ji ku digire?

Li gorî baweriyên Mezopotamyayê dayik ji bo zarokên xwe yên nû hatine dinê ji xirabiyan û îblîsan biparêzin, nivişteke şîn ku dişibiya rengê çavên xwedawend Îştarê bi kar dianîn. Wekî ku tê zanîn xwedawend Îştar her çiqas wek xwedawenda evîn û bereketê bê naskirin jî di taybetmendiya wê de parastin jî hebû. Li gorî baweriya jinan divê rengê nivîştê şîn bûya, ji ber ku rengê çavên xwedawend Îştarê şîn bûye.

Yanî rengê şîn nîşaneya xwedawend Îştarê bû. Heta ji ber vê yekê peresgeha Îştarê ya dema Babîlan jî bi rengê şîn hatiye xemilandin.

Ev rengê şîn ê xwedî dîrokeke kevn e, bi demê re piştî derketina baweriya yekxwedayî û li nav civakê avakirina serdestiya mêr, wek şirîk hat dîtin. Tenê ne şînok gelek baweriyên ku xwe dispêrên çanda xwedawendiyê ji aliyê mêran ve yan aydê mêran an jî wekî şirîk hatine dîtin.

**Domandina çandekê**


Wekî di baweriya şînokê de jî em dibînin jin tevî hemû êrîşên baviksalariyê (bi taybetî mêr ji bo tunekirina civakbûnê her tim berê êrîşên xwe dane nirxên ji aliyê jinan ve hatine avakirin) baweriya xwe ya xwedawendan bi rêyên cuda domandine. Her çiqas di roja me ya îro de, rastiya van baweriyan neyê zanîn û wek baweriya bêbînî bê dîtin jî, ew bawerî bi awayekî xwe didin domandin.


Divê ev baweriya ku çand, ol û sînorên erdnîgariyan derbas kiriye û her çiqas bi awayekî baş neyên zanîn jî tenê wekî moriyek ango modayê neyê dîtin. Şînokê di destpêka şaristaniyê de hebûna xwe parastiye û baweriya mirovahiyê dide der.

Ji ber ku di bin her baweriyê de rastiya mirovahiyê ya ku li dor jinan hatiye avakirin heye.

Divê em ji bîr nekin di her çend û baweriyên ku ji aliyê jinan ve tên domandin de şopa xwedawendan heye. Heta di baweriyên yekxwedayî de ku her çiqas di roja me ya îroyîn de ji aliyê pergala serdestan ve bê înkarkirin jî çanda xwedawendiyê her hebûye û heye.









**Biyan**

Munewer Azîzoglu Bazan

## Nameya (xwe) kuştinê

Gelo we qet nameyên beriya xwekuştinê xwendine? Li gorî lêkolînan ev name demeke kin beriya xwekuştinê tên nivîsandin û derûniya kesa/ê xwekuştî bi awayekî tazî û balkêş didin der. Di nameyan de bi giranî mijarên wek "lêborîna xwe xwestin/şermkirin", "barê giran ê jiyanê" û "bêhêvîtî/wateya jiyanê windakirin" tên destgirtin. Dîsa li gorî lêkolînan di xwekuştinên kesên ciwan de herî zêde jin name li dû xwe dihêlin. Û yên di temen mezin de bi giranî mêr name dinivisînin.

"Nameya dawî, gotinên dawî, nameya xatirxwestinê, nameya berî xwekuştinê"… Ev çend nav in yên ji têşeya vê nivîsê re tên gotin. Xwekuştin fenomeneke jiyana civakî ye û bi gelek awayên cuda derdikeve pêşberî me. Di zanistê de lêkolîneke bi navê "suizid/suicide (latînî: xwekuştin)" heye. Di jiyana wêjeyî de nameyên xatirxwestinê xwedî ciheki taybet in. Bi taybetî nameyên kesên hunermend piştî dawî li jiyana xwe tînin, tên weşandin û ev kes hunera xwe di nameyên li dû xwe hiştî de jî bi kar tînin. Nameyên dawî yên hunermendên xwekuştî (wek Wirginia Wolf, Kurt Cobain, Nilgun Marmara) wek berhemeke dawî tên nivîsandin; mirov tehmeke wêjeyî ji nivîsê derdixîne û heta gelek caran windahîbûna kesê/a xwekuştî di van nameyan de tê jibîrkirin. Ji bo hunermend nameya dawî wek derba firçeya dawî ya li ser wêneyê ye.

Ya rastî nameyên xwekuştinê ne her tim wêjeyî ne. Gotinên dawî yên ji hêla kesên xwekuştî ve tên nivîsandin pirî caran bi hêsanî nayên fêmkirin, wateyên ku di pişt peyvan de veşartî ne, bi kesa/kesê xwekuştî re dikevin bin axê. Ji yên li dû mayî re tenê hevokên hatine nivîsandin, an jî tomarkirin diminin. Mijareke din jî wergirên nameyê ne. Mirov ji bo nameyên xwekuştî dibêje "name li dû xwe hişt". Şandî diyar e lê wergir gelek caran ne diyar e. Nameyeke bê navnîşan e. An jî bi gotineke din wergir "jiyana li dû mayî" ye. Herçiqas hin name xîtabî hin kesên taybet bikin jî, bi giranî di naverokê de kesên xwekuştî bi awayekî giştî qala xwe dike. Peyvên "ez û min" zêdetir cih digirin. Heta mirovên ku dawî li jiyana xwe tînin, belkî jî cara yekemîn û her wiha dawî di jiyana xwe de firsenda 'behsa xwe kirinê, xuyakirinê û bihîstinê' bi dest dixin û vê yekê bi rêya nameyê bi lêv dikin. Zimanê tune û winda bi rêya nivîsê xuya û mayînde dibe. Lewma jî gotina dawî ya rastî ji bo wan hîn gotina destpêkê ye. Wekî ku tê gotin "gotin difire, nivîs dimîne."

Dema cihê bûyerê Kurdistan û Rojhilata Navîn be, pirî caran wate û naverokên zanînên giştî pûç dibin. Name dibe tiştekî din, xwekuştin dibe tiştekî din. Nameya xwekuştinê dibe nameya "destdirêjiyê, îfşayê yan jî şermê". Peyvên namê li hewayê difirin. Hê beriya xwediyên xwe dixwazin xwe ji zinaran bavêjin. Li hevudû nanêrin, wekî xwediyên xwe şermok û şaşwaz in. Newêrin serê xwe bilind bikin. Ger bilind bikin jî awiran rêya xwe şaş dikin. Hin peyv jî ji mirinê xirabtir in. Wek kêlandiya Ezraîl li ser serê wê kesê xwe dorpêç dikin, pênûsa wê lal dikin. Peyvên wek "qirêjî, namûs, tirs, şerm…" diherikin ser kaxiza qurmiçî. Wekî ku bibêjin, "lez bike, tu dereng mayî" bi lez û bez pênûsê ji dest digirin. Dest û lingên wê hişkehişk girê didin. Ev peyv cerdevanên ber deriyê xwekuştinê ne.

Wek bûyer destdirêjî li aliyekî lê baweriya bi "qirêjbûna namûsê" û şerma ji ber vê yekê sedema sereke ya xwekuştinê ye. Ji ber ku di vê mijarê de hemî niqaş li ser "cinsî"yê dimeşe, şîrovekirin û jê encam derxistin jî li ser vê bingehê tê kirin: Jin a qirêj dibe, mêr ê qirêj dike ye. Û (xwe) kuştin wek yek ji amûrên "namûsa xwe paqijkirinê" wek peywir derdikeve pêşberî kesan. Hemî bar dikeve ser milê (xwe) kuştî lê di rastiya xwe de mijar mijara desthilatdariyê ye û girêdayî vê polîtîk e. Lewma divê destdirêjî ji nû ve bê pênasekirin û şîrovekirin. Tenê bi vî awayî mirov dikare mijarê bike mijareke civakî û barê ji ser milên kesa qurban rake. Heta ku destdirêjî di bin siya "namûs û qirêjiyê" de bê pênasekirin dê nameyên xwekuştinê yên bizdonek kêm nebin.

Li hêla din, xwekuştin tiştekî wek çalakiyeke takekesî û bi biryar û îradeyeke azad tiştekî ye lê ji ber sedemeke wekî destdirêjiyê ku sûc e û failê wî sûcî heye, xwekuştin tiştekî din e. Her çiqas mirov bi destê xwe dawî li jiyana xwe bîne jî, ev yek ji ber sedem û êrîşên ji derveyî îradeya mirov diqewimin tê lidarxistin û ji ber vê yekê jî di bingeha xwe de ne "xwekuştina bi îradî" ye. (Xwe) kuştina ji ber encamên destdirêjiyê, -namûs û qirêjiyê- kuştin e û kujerê wê jî tu carî ne yek e. Lewma ye ku wergirên nameyên kesên (xwe)kuştî hemî kesên li dû mayî ne.



## Li şûna tecawizkar malbat ceza kirin!

Li bakurê Kurdistanê qurbaniyeke din li qurbanên dewletê zêde bû. Keça ciwan a bi navê Î.E. ku çawişê pispor Mûsa Orhan dest dirêjî wê kiribû jiyana xwe ji dest da. Di 16'ê tîrmehê de Î.E nameyek nivîsandibû û hewl dabû ku dawî li jiyana xwe bîne. Î.E. di nameya xwe de qala serboriya xwe ya bi çawişê tecawizkar re kiribû. Destnîşan kiribû ku çawişê pispor Mûsa Orhan 20 rojan ew desteser kiriye û bi dehan caran dest dirêjî wê kiriye.

Î.E'yê di nameyê de gotibû ku ew ne mirî ye ne jî sax e û hewl dabû întihar bike lê ji aliyê malbata xwe ve hatibû ferqkirin û malbatê ew li Êlihê rakiribû nexweşxaneyê. Ev bûyera hovane di rojeva Tirkiyeyê de cihekî girîng girtibû û gelek bertek hatibûn nîşandan. Piştî van bertekan çawişê pispor Mûsa Orhan hatibû binçavkirin û li gel desteserkirina xwe ya 20 rojan jî kirêtiya xwe bi hinceta serxweşiya xwe parastibû.

**Hew deyax kir**

Ev parastin ji aliyê dadgeha tirk ve hatibû qebûlkirin û çawişê tecawizkar hatibû berdan û li ber çavê herkesî vegeriyabû ser peywira xwe. Piştî mehekê keça ciwan Î.E. li Êlihê li nexweşaneya ku lê tedawî dibû êdî hew deyax kir û jiyana xwe ji dest da. Piştî vê yekê bi sed hezaran kes li ser medyaya civakî bertek nîşanî dewletê dan û bi hastaga #BILAMUSAORHANBÊGIRTIN daxwaz kirin ku çawişê tecawizkar bê girtin.

**Zextan da girtin**

Di serî de li Êlihê li çend bajaran jî welatî li dijî vê hovîtiyê derketin kolanan û meş li dar xistin. Dîsa sazî û rêxistinên jinan jî di derbarê mijarê de daxuyanî dan û daxwaza girtina tecawizkar kirin.Li gel van bertekan jî derbarê bûyerê de ji hêla hikûmeta AKP'ê ve tu daxuyanî nehat dayîn. Lê ji ber bertekên zêde çawişê pispor Mûsa Orhan ji peywirê hat dûrxistin û girtin. Li aliyê din çapemeniya alîgirê AKP'ê jî bûyer paşguh kir û bi tu awayî cih neda hovîtiya ku pêk hatiye.

**Tevlêbûnê qedexe kirin**

Dema veşartina Î.E'yê jî dewletê li şûna tecawizkar malbat ceza kir. Dewletê parlamenter, nûnerên rêxistinên sivîl û parêzvanên mafên mirovan ên ji bo piştgiriya malbatê xwestin tevlî merasîma cenaze bibin asteng kirin û nehişt tu kes êşa malbatê parve bike. *ÊLIH*

# Bêastengî di sînoran de derbas dibin

**Penaberên ku ji Afganistan, Pakistan û Ozbekistanê di ser Îranê re derbasî Tirkiyeyê dibin, diyar kirin ku dema derbasbûnê ji aliyê leşkerên ser sînor ve rastî tu astengiyan nehatine û ji bo şertên aborî terka welatê xwe kirine**

Bêrîvan Kayî



Bi salan e ji welatên mîna Afganistan, Pakistan û Ozbekistanê mirov ji ber xîzaniyê terka welatê xwe dikin û ber bi welatên cuda ve dibin koçber. Yek ji van welatên ku berê penaberan lê ye Tirkiye ye. Di rojên dawî de bi hezaran welatiyên her sê welatên navborî di ser Îranê re derbasî herêma Serhedê ya bakurê Kurdistanê dibin. Dixwazin ji vir jî biçin bajarên mîna Stenbol, Konya, Nîgde, Ankarayê yên Tirkiyeyê lê berî ku biçin van bajaran bi piya tên bajarên mîna Êlih, Amed û Mêrdînê û ji vir derbasî bajarên rojavayê Tirkiyeye dibin.

Li gorî angaştên penaberan ji bilî rêyên qaçax ji deriyên sînor ên di navbera Tirkiye û Îranê re jî bi hêsanî derbasî Tirkiyeyê dibin. Ji zarokên 8 salî heta kesên 40 salî jî di nav penaberan de hene. Ji ber ku bi rojan dimeşin, binê piyê wan werimîne û av girtine. Dîsa di piyên gelekan de birîn vebûne. Weke rojnameya Xwebûn me xwe gihand penaberên ku li otogara Amedê li hev kom bûne. Em li ser derbasbûna wan a ji sînoran û çûyîna wan a ber bi bajarên rojavayê Tirkiyeyê bi wan re axivîn.

**Kom bi kom in**

Penaber li otogarê kom bi kom di bin siya daran de li benda bilêtan in ku biçin bajarên ku naskiriyên wan li wan hene û dest bi karekî bikin. Piraniya penaberan jî ciwan in û li gorî bajarên ku biçinê jî cuda cuda li hev kom bûne. Li gorî agahiyên ku qefla dê biçe Stenbolê da; dema ji deriyê sînor ê di navbera Îran û Tirkiyeyê re derbas dibin her çiqas ku carinan rastî zextên leşkeran werin jî bi giştî dema tên ber derî bi hêsanî û bê astengî derbasî Tirkiyeyê dibin.

**Mehek meşiyaye**

Penaber bi armanca ku şert û mercên aboriyê yên Tirkiyeyê li gorî şertên welatên xwe baştir dibînin hatine û piştî rêwîtiyeke 44 rojan xwe gihandine otogara Amedê. Penaberê bi navê Armanî (15), diyar kir ku bi boneya rewşa wan a aborî li Pakistanê nebaş e berê xwe daye Tirkiyeyê û ev 7 roj in ku li otogarê li benda çûna Stenbolê ye. Armanî, da zanîn ku 2 xwişk û 5 birayên wî hene û ji bo ku ji malbata xwe re bibe alîkar berê xwe daye Tirkiyeyê û wiha got: "Dema em hatin sînorê Îran û Tirkiyeyê, rastî tu astengiyê nehatin. Piştî rêwîtiya 30 rojan hefteyek berê em ji Wanê hatin Amedê."

**Piyên wan werimîne**

Penabera bi navê Zehra Newrozî (40) jî 30 sal berê ji Afganistanê derbasî Îranê bûye û niha jî bi 4 zarokên xwe re ji bo sedemên aborî ji Îranê berê xwe daye Tirkiyeyê. Li gorî agahiyên ku ew dide 4 sal berê hevjînê wê jiyana xwe ji dest daye û rojên pir zor û zehmet jiyaye. Newrozî, got ku di deriyê sînor re derbasî Tirkiyeyê bûye û rastî tu zextan nehatiye û ji ber ku demeke dirêj e di rê de ye pêyên wê û yên zarokên wê werimîne. Newrozî jî dixwaze bi 4 zarokên xwe re derbasî Nîgdeyê bibe. Li ser pirsa me ya çima Nîgde jî got ku naskiriyên wê li wir hene ew dixwaze derbasî Nîgdeyê bibe.

**Cara duyemîn e tê**

Penaber Fazil Raûfoglû (27) jî ji Afganistanê hatiye û di nav qeflaya dê biçe Enqereyê de cih digire. Raûfoglû, diyar kir ku ji bo şertên aborî berê xwe daye Tirkiyeyê û ev tişt got: "6 sal berê jî ez hatibûm û li Eskîşehîrê jiyabûm. Piştî ku min hinek pere qezenc kir careke din derbasî Afganistanê bûm. Niha sedema rewşa aborî ya xerab min careke din berê xwe da Tirkiyeyê. Ez ji Afganistanê derketim çûm Tehranê û ji wir jî derbasî Agiriyê (Bazîdê) û Amedê bûm. Di deriyê sînor ê Îran û Tirkiyeyê re rastî tu zextî nehatim. Leşkerên li ber deriyên sînor carinan li hin penaberan xistin û nehiştin ku derî derbas bikin. Ew disekinandin kinc û çenteyên wan dişewitandin lê di dawiyê de ew kes careke din derbas dikirin."

# Microsoftê kurdî li zimanên xwe yên wergerê zêde kir

Navenda Nûçeyan

Li her çar parçeyên Kurdistanê bi milyonan kurd dijîn û ji bilî başûr û rojavayê Kurdistanê, li her du parçeyên din zimanê kurdî di rewşeke xeternak de ye. Ji bo ku ev rewş bê nixumandin, tenê ji bo zimanê kurdî li Îran û Tirkiyeyê ji aliyê dewletê ve televîzyon hatine vekirin. Dîsa li çend zanîngehan beşên zimanê kurdî hatine vekirin û weke dersa bijarte kurdî li dibistanan dikare bê hînkirin.

Tevî vê yekê jî di pratîkê de ji bo peşxistina zimanê kurdî tu xebat nayên kirin. Li şûna xebatê ji bo ev tiştên heyî jî ji holê rakin hin hewldan hene. Herî dawî derket holê ku li Tirkiyeyê zanîngehan jî bo tezan şertê tirkî daye pêşiya xwendekarên kurd ku dixwazin ji beşên kurdî derbiçin. Dîsa li Îranê mamosteyeke ji ber xebat û perwerdeya zimanê kurdî hat cezakirin. Ji van her du parçeyan cudatir li rojavayê kurdistanê ji aliyê Rêveberiya Xweser ve perwerde bi kurdî tê dayîn û xebat ji bo kurdî tên kirin.




Her çiqas li Kurdistanê ji aliyê dewletên ku kurd di bin serweriya wan de dijîn, zimanê kurdî bê astengkirin jî di qada navneteweyî de ji bo zimanê kurdî xebatên girîng tên kirin. Kompaniya Microsoftê ya Amerîkayê ku kompaniyeke mezin a teknolojiyê ya li tevahiya cîhanê ye, her du zaravên sereke yên zimanê kurdî (kurmancî û soranî) li lîsteya xwe ya zimanên wergerê zêde kir.

**Kurmancî û soranî**

Microsoftê nûçeya zêdekirina zimanê kurdî li lîsteya xwe ya zimanên wergerê, li ser malpera xwe belav kir. Li gor nûkirina herî dawî ya Microsoftê, zaravên kurmancî û soranî, di appa wergerê ya wê kompaniyê de tên danîn û bikarhêner dikarin bi rêya appa wergerê, Microsoft Office û appa Bing, zêdetir ji 70 zimanên cihgirtî yên cîhanê yên di lîsteyê de bo zimanê kurdî û ji kurdî bo wan zimanan wergerînin.

Her wiha li gor nûkirina dawî ya Microsoftê, çêdibe ku zimanê kurdî ligel her du zaravayên kurmancî û soranî di appa xizmetguzariya Ajor de li ser mobaylê û malpera Microsoftê were dabarkirin.

**Ji 1999'an ve werdigerîne**

Kompaniya Microsoftê, der barê zimanê kurdî de ragihandiye: "Kurdiya Bakur û Navîn du şêweyên zimanê kurdî ne ku herî zêde tên bikaranîn. Kurdiya Bakur ku weke kurmancî tê naskirin, li Tirkiyeyê, Sûriyeyê, bakurê Iraqê û bakurê rojava û bakurê rojhilatê Îranê ji aliyê 15-17 milyon kurdan ve tê axaftin. Kurdiya navîn jî ku wek soranî tê naskirin û tê texmînkirin ji aliyê 9-12 milyon kurdan ve li Kurdistana Iraqê û rojavayê Îranê tê axaftin. Ew du zarava nêzîkî %75 ji tevahiya axêverên kurd pêk tînin."

Appa wergêrana Microsoft Bing Translatorê di sala 1999'an de hatiye damezrandin. Di 20 salên bihurî de amûrên wergerê yên bi 73 zimanên cîhanê gelek hatine pêşxistin. Êdî ji niha pê ve zimanê kurdî derbasî nav wan zimanên cîhanê bû ku di lîsteya zimanên wergerê yên Microsoftê de ye.

## EM DU BIRA BÛN, DINYA JI ME RE FIREH BÛ, EZ TENÊ MAM DINYA LI TENG BÛ

# Kurdî her di dilê min de bû

→ Zozan Yaşar

*Ali Duran Topuz bi nasnameya xwe ya rojnamegeriya tirkî tê nasîn lê belê herî dawî pirtûka bi navê 'Rû û Kûr' derket pêşberî xwînerên kurd. Topuz bi kurdiyeke resen a Qoçgiriyê pirtûk nivîsandiye.. Topuz, di kitêba xwe de bi gelemperî li ser mijarên komkujiya ermenan, bûyerên Qoçgiriyê, Komkujiya Dêrsimê û çîrokên ku di nav civaka wî de bûne sembol bi awayekî felsefî aniye ziman. Topuz ji rojnameya me re qala çîroka xwe û nivîsandina xwe ya kurdî kir.*

> Paşê meselê fêm dikin ku komutanên wî bi kutanê wî kuştine. Êdî kirîvê wî ser wî klamek derxistiye. Nivîsên klamê cem min heye lê musîc tuneye belkî rojekê yek karibe ji bo çîroka xemgîn ya Nûr Alî muzîkeke xweş çêbike û bibe klamek xweş

**Dewletê navê gundê me yê kurdî wergerand tirkî**

Alî Duran Topuz di destpêka hevpeyvînê de ji me re qala çîroka navê gundê xwe dike û dibêje:

"Ez 8 salî bûm em hatin Stenbolê ji Qoçgiriyê. Gundê me gundê Bolucanê jê re dibêjin. Girêdayê Zarayê ye. Li derdora Bolucanê 91 gund hene, gundê me ji wan yek e. Navê gundê me bi xwe bi tirkî bû. 'Koşetuzca' Korceya berê yaylaya eşîreke tirkan bû ye. Paşê yê me hatine li wê niştecih bûne. Ên me dibêjin Koşetuzca-Korcetuzla ji ber ku zimanê wan nagire dewlet bi Korcetuzla jî qayîl nebûye, îcarê navê gundê me kirin Evrencik yanî bû gundê Kenan Evren."

Topuz li zanîngeha Stenbolê beşa hiqûqê dixwîne û piştre du-sê salan parêzerî dike lê ji bo rojnamegeriyê dev ji hiqûqê berdide. Ew dibêje qeyda wî hê li baroya Stenbolê heye lê gava ku ew xwendekar bûye di zanîngehê de rojnamegerî kiriye û nexwestiye dev jê berde;

"Parêzerî ji hêla aboriyê ve têra min nekir û gava ku min dest pê kir di sala 1999'an de staja xwe qedand. Di wê demê de diviyabû ez li cem parêzerekî bixebitiyama. Min buro vekir lê zêde kar çênebû. Min dev ji rojnamegeriyê bernedabû. Gava ku ez xwendekarê lîseyê bûm, min dest bi karê rojnamegeriyê kir û ew rê ji min re nêzîktir hat û min di wê rêyê de berdewam kir."

**Kurdî her tim di jiyana min de bû**

Têkiliya Topuz û kurdî ji zaroktiya wî ve dest pê dike. Dibêje her tim di mala me û jiyana min de kurdî hebû û berdewam dike. Der barê vê yekê de wiha dibêje;

"Dema me mala xwe anî Stenbolê tenê bavê min bi tirkî diaxivî. Dapîra min jî ji xwe tirkî nizanîbû û heya mirina xwe jî ne dixwest bizanibe. Diya min hîn saxe lê wê jî qet nedixwest tirkî bizanibe. Me ew ji bo ku here sûk û bazaran û îşê xwe hel bike hinekî hînî tirkî kir lê qet hez nedikir. Niha jî bi neviyên xwe re dixwaze dîsa bi kurdî bipeyve."

Her wiha Topuz dibêje îdeolojiya dewletê ya li ser Qoçgiriyê bi ser ket ku dibêjin em hemû ji Xorasanê hatine, em tirk bûne û dev ji çanda xwe û kurdiya xwe berdane;

"Şensê min ev bû ez ji malbateke kurdîhez û kurdîzan im. Wekî din tu diçî mektebê her tişt bi tirkî ye. Li kolanan, kuçeyan, çarşiyan, danûstandina wê û karê wê hemû bi tirkî ye heta debara mala te jî dibe tirkî. Wayê 35 sal in ez bi tirkî qezenca xwe dikim lê her tim hem di êşa min de, hem di dilê min de, hem jî di bîra min de kurdî hebû."

**Selîm Temo got ew ê meseleya gramerê çareser bike lê piştî min pirtûkê qedand wî got, "Wele keko ez jî nizanim em bi vê pirtûkê çi bikin."**

Topuz dibêje min her tim dixwest bi kurdî binivîsim. Min çi didît not digirt û qeyd dikir lê vê pirtûkê min nediwêrîbû dest pê bikim.

'Rojekê Selîm Temo bû mêvanê min û min notên xwe jê re nîşan da û Selîm pir pê qayil bû bi pêsîra min girt û got bira vana li vira nemînin tuyê binivîsî piştî wê di nav 7-8 mehan de min kitab nivîsand. Selim ji min re got dema te qenand min agahdar bike çunkû min giramerê û rêziman nizanibû. Selim got ew ê wan meselanyan çareser bike. piştî min got eva qediya em çi bikin got wele ez jî nizanim û got em bişînin ji Mazlûm Dogan re.

Min Mazlûm nas ne dikir tenê min navê wî dizanî. Wekî din jî ez çûm cem Adullah Keskin(Avesta) nêzîkî du mehan me hevdû bir û anî wan got di kurdî de tiştek wisa tuneye werhasil, piştre bavê min nexweş ket nêzî bîst rojan me nikarîbû bi hev re biştexilîn. Paşe Mazlûm hat got keko tiştên heta niha min ji te re gotiye hemû ji bîr bike. Mazlûm diçe di vê demê de li ser kurdiya Qoçgiriyan dixebite herhal bûka wî jî ji Qoçgiriyê ye wî got niha cudatî heye lê şaşitî tuneye. Bi alîkariya Selim û Mazlûm ev kitabana hate holê.

Alî Duran Topuz ji me re hin helbestên xwe dixwîne û çîrokên wan jî weha vedibêje.

*Em du bira bûn, dinê me ra fere bû. Ez tenê mam dinê min ra teng bû.*


Şîna du biran de; birayê min 30 salî bû ji min salekî biçûktir bû û ji nexweşîyê mir. 4 sal nexweşî kişand ew şîna wî bû. çavkaniyên jiyana min, serpêhatiyên min û çanda min bi xwe ne.

Topûz diêje Sê çavkanîyên min hebûn yek ji wan çirokên berê, serpêhatiyên berê hatine gotin. Yek ewne ev bîra gel e çawa bêjim em çawa hezdikin wisa li ser wan diaxivim. Yanî rastiyê nişan nadin ew lê rastî tê de heye û gorî dilê xe wî rastiyê diguherinin. çirokên ku dayika min û pîra min min ra deng dikir , ev jî tiştên ku hatine serê min in.

Topûz li ser gelek meseleyên dîrokî disekîne û dibêje li ser meseleya filleyan, ser meseleyan qirkirina ermeniyan pir tişt têne gotin lewma jî min di her çîrokekî de fikrand û li ser wan çirokek nû nivîsand.

Ali Duran Topuz komkujiya Dêrsîm û Qoçgiriyê bi hev re rawe dike û dibêje

Yên ku li ser erdnigarî û dirokê dixebitin dibêjin Qoçgirî Dersîm e. Ji xwe her du çand di nav hev de ne. Hûn dizanin li ser Qoçgiriyên Miroglu gotine hêla tirkî de dibêjin 'Ovacigin aşîretî Hozat çekmedî qahiretî' yanî dilê wan li hêla Dersîmê maye çunkû ew nav hev de ne.



**Kêfa min ji nivîsên li ser kurdên Kafkasyayê, li ser kurdên Serhedê û ji nivîskarên nû re tê**

Min kîjan kitêba kurdî, çi helbest be çi roman be, çîrok be min girtiye destê xwe tesîra wê ser min çebûye. Çimkî dema mirov zimanê kurdên Kafkasê dixwîne wek zimanek din tê ji mirov re. Min pirtûka Burhan Tek xistibû destê xwe min heya neqedand nikarîbûm rakevim. Min kiteba İnan Eroglu xwend ew jî pir kefa min jê re hat ew jî pir pir xweş bû û bi cesaret nivîsandibû. Kurdên kafkasyayê û kurdên Serhadê tiştên ku ew dinîvîsenin pir kêfa min ji wan re tê. Tiştên klasîk helbet tesîra wan zêde ye dema min Cizîrî xwend an Ahmedê Xanê xend rihe min bir cîyek din.

**Belkî rojek yek karibe muzîkek ji bo çîroka xemgîn a Nûr Alî çêbike û bibe klamek xweş**

*Nûralî û Resûl*

*Berê kî girtin eskerê nayê bîra me. Berê kîjan li êsker kuştin, me ew jî ji bîr kir. Herduyan jî heftekî xwîn û nem verişiyan. Me yek bir Elezîzê, yek bir Zerayê. Doxtoran gotin wek gurêxan kezeb û gurçiyê gencê 'di we bila kirine wan hoviyan.*

*Axirî me herdu jî dan herdê, lê me qe nezanî wana îro dîsa çima ketine pê canê'di gencên me. Me tenê tiştek zanî ku xortên me nebirine Yemanê lê Yeman hanîne Enqerayê.*

Ev meseleya Nur Alî pir dilê mirov diêşîne. Ew 1950' de birine leşkerîyê û birine Enqereyê li leşkeriyê lêdixin û dişînin malê piştî heftîyekê dimirê. Paşê meselê fêm dikin ku çavuş û komutanên wî bi kutanê wî kuştine. Êdî kirîvê wî ser wî klamek derxistîye. Nivîsên klamê cem min heye lê musîc tuneye belkî rojek yek karibe em muzîkek bo wê çêbikin û bibe klamek xweş.

Di çanda alewîyan de kizilbaşan de tu dikarî bavê xwe xwişka xwe bavêjî alîyekî lê tu nikarî musayîrê xwe bavejî ew bo wan gelek muhîme. Ji ber ku êşa Nur Alî gelek kesan êşandîye tiştên ku ser wî hatine gotin bi salan vê hatîye parastin. Min wan gotina berhev kir û min ji xwe re got gelo ez kirîvê wî bûma min çi digot. Bavê wî bûma min ê çi bigota. Yanî min wekî gotinê wan gotinê xwe derxistin. Min wan gotina anî cem hev lê min wek çirokek ne nivîsand. Min bi awayekî cûrbecûr nivîsand. Bavê Nur Alî wisa dibeje kirîve Nur alî wisa dibeje Musayîrê Nur Alî dibeje. Yanî çawa çîroka wî bi perçê perçê hat ber destên min min jî wer nivîsand.

**Li ser ferhengeke devoka Qoçgiriyê dixebitim**

Ez niha dixwazim ferhengekê Koçgirî tê de zargotin û çîrokên berhevkirî û klamên alîyê me de jî te de hebin amadê bikim û piştre jî Kurdîya standart binîvîsîm. Tabî ev salekê ku ez ser gramer û ser zimanê jî dixebitim Herwiha, ez dixwazim analîza psikolojîk û analîza sosyopsikolojîk jî bişuxilim. Niha projeyekê min ku ez bi tirkî romanek an jî pirtûkek binivîsîm tune ye. Min berî çendekî tiştekî ser antî hukuk nivîsand bi tirkî lê wek roman an jî kiteb nafikirim.

**Standartbûna kurdî bi qasî devokan girîng e**


Meseleya standartbûnê wê her tim di hişê me de bimîne. Em ê berhevan kom bikin ji devokên cuda cuda bes mesela standartbûnê jî meseleyekê muhîme. Di devokê de divê mirov giran giran qedr û qiymeta devokan bizani be û hem jî mesela standartbûnê jî ji bîr neke.

**Li gel şîna me şahiyên me jî li Qoçgiriyê zêde ne**

Topuz dibêje her çiqas em bi şînên xwe derkevin pêş jî şahiyên me ji gelek in û wiha berdewam dike

Di zemanê berê de bapîra min ev çîrok bo min digot mesela di wan dema de genim firotin tiştekî eyb dihat hesibandin. Carê tê gotin ku di wan çaxan de li Qoçgîrî genimfirotin aybik giran bû. Ji alîkî ve va çîroka qala qîmeta aborî dike, ji alîkî din ve jî qala qîmeta sembolîk dike. Yanê ez dibêm genim ji alîkî ve tiştekî ekonomîk e, ji alîkî din ve tiştekî ne ekonomîk e, lê sembolîk e… niha, lazim e ku hun dîsa bipirsin, va çawa tiştek aborî ye ku firotin eyb e, hem jî eybek giran e. Di çîrokekê de jî qezîk heye, qehremanê çîrokê dibejî: "Zimanê Qoçgîrî ji genimê Qoçgîrî pirtir e……. Ew belkî birçî diskinin….. lê qet bê qezî naskinin." Yanî em der barê xebatên xwe de bi me û xwendevanên me re par vekirin.

## Alî Duran Topuz kî ye?



Di sala 1967'an de li Sîwasê jidayik bûye. Lê di nasnameyê de wekî sala 1966 hatiye nivisîn û nav jî tenê Alî hatiye hatiye nivisandin ji bo nasnameya elewîtî dernekeve pêş. Di sala 1976'an de malbatê koçî Stenbolê kiriye. paşê li wir fakulteya hiqûqê xwendiye û bûye parêzer. Ji sala 1994'an de û pê de 17 salan di rojnameya Radîkalê de rojnamegerî kiriye. Di rojnameya Dîwar û gelek malperan de gotar û çîrokên wî hatine belavkirin.

# Çîroka Qeraşê Beraşan

Çi hewiye çi tunewiye, rîvîk û qeraşik hewiye. Rûkê rîvi qerêş ra diwê, were am ta bi kaçika paşê ve bizewicînin! Qeraş diwê, halê me li ûrtê ye, em li ku kaçika paşê li ku! Rîvi qerêş ra diwê, wî îşî ti mi ra bihêle! Qeraş diwê temam!

Siwetirê, rîvi qerêş ra diwê rawe em dikin harin keçika paşê bixwazin, xwa hazir ke! Qeraş diwê, az barê de hazir im, hare ware kincikî min haya, aw î jî li min e. Rîvi diwê, ti rawe hele am ê îşikî bikin! Qeraş radiwe bi rîvi va dikevin rê, tên ber çakê. Rîvi, qerêş ra diwê kincê xwa derxe! Qeraş, diwê rîvi, ti şaş biwîye, çima a kincên xwa derxim, am ê xwa li çayê xin harin! Rîvi diwê, qeraşê mi ti guhu mi de, kincê xwa derxe! Rîvi dewam dike û diwê, qeraş, binir taza az ê harim mala paşê az ê biwêm walle em rê ve dihatin ku warin mala wa, kincên havalê min çayê da çûwîn. Ku mala wa hawi, hawîn bikanin kincina bidin, az berim havalê xwa ra. Paşa diwê temam! Paşa radiwe kincini fûdil dide rîvi, diwê, ha va kincan bere havalê xwa ra bira li xwa ke! Û paşa diwê dixwaze bira çend peyayên mi jî rev te warin! Rîvi paşê ra diwê, garak nake, diwê hwîn tanê hespikê bi mi din bas a. Paşa wê ra jî diwê tamam û hespikê didin rîvi. Rîvi, haspê û kincan tev digire û tarra hinda qerêş. Qeraş wexta ku dihwîne rîvi bi kincên xwaş û haspik dîri va hat, şaş diwe! Qeraş diwê, havalê rîvi, te av kinc û haspa li ku hanîn? Rîvi, hal meselê pê ra diwê.

Qeraş kincan xwa dike û şun da, pir pê camêr diwe. Paşê li haspê siyar diwe û bi rîvi va dikevin rê. Wexta tarin digîjin mala paşê, paşa dihwîne ku peyakî têye ti çitlî biwê werg e! Rîvi û qeraş tên ber qûnaxa paşê li haspa xwa dadikişê. Paşa, qerêş ra diwê ti derbasi quncê jûrin we. Qeraş tarra riwîdine û pir narre nan tê. Wexta ku nên dixwin, qeraş gûşt dixwe û hestiyan jî dikute bin balîvê. Paşa rîvi ra diwê çima wa hestiyan dikute bin balîvê? Rîvi diwê li malê pisik misikê wî hana, wê sewê aw wer dike. Axa e'mel dike. Nanê xwa dixwin û şun da, rîvi kaçika paşê sewa qerêş dixwaze. Paşa diwê çima ne, diwê az ê li wa rintir wekî din kê bihwînim?

Qeraş û rîvi, kaçika paşê digrin û tarin. Rê va, qeraş nîzîki rîvi diwe û diwê: Havalê rîvi, ma kaçika paşê girt lê am ê vê berin têkin ku? Ma ne xani ye ne qûnax e! Rîvi dîsan diwê, ti wî îşî mi ra bihêle, az ê hal kim! Qeraş diwê temam! Pir narin rîvi tarra qerêş ra diwê a dikim pîşiyê da harim haziriyê bikim sewa we. Qeraş diwê temam, diwe! Ti hare am ê jî hîdî hîdî warin.

Rîvi tarra derkê ku, pirikik li bere qûnaxika mazin li ber naxirika mazin a. Rîvi nîzîki pîrê diwe, diwê xaltiyê, va naxir û qûnaxa ê kê ne? pîr diwê, ê min in, xêr we? Rîvi diwê xaltiyê, askarên paşê vir ve têne, çi têye pîşiya wan dikujine. Pîrik ditirse, diwê, rîviyê min ûxil, az çir kim? Rîvi diwê, xaltiyê, wara têkeve bin vê gidîşê. Tarra dikava bin gidîşê şun da, rîvi tarra arikî berdide gidîşê û pîrê dişewitîne. Paşê naxir û qûnaxa pîrê jî xwa ra digre. Rîvi diwê, me şina manê jî hal kir, maka az ber vi qerêş harim mîzginiyê bidimê. Ber vi qerêş tarra, diwê, qeraşê mi, mi şina manê jî hal kir. Qeraş pir şa diwe û kaçika paşê digrin tarrin dikavin qûnaxa pîrê.


Rûkê, rîvi diwê ha naka, a xwa carê mirin nim hala vana diwên çi!? Rîvi tarra xwe mirin dine. Qeraş dihwîna ku rîvi eyni mîna miriyan dirêj biwîye, tarra diwê rîviii, rîviii! Li rîvi dang nayê! vir da dike wê da dike li rîvi dang nayê! Diwê te dî, rîvi miriye! Bangi jinika xwa dike, diwê, jinê 'paçan bigre destan, bûçê bigre bavê kaşan!' Jinik tarra pêç digre ku pê bûçika rîvi bigre bavê, rîvi radiwe ser xwa û diwê: "Qeraşê beraşano, mi ti kir ênîştê paşano, taza jî 'paçan bigre destan, bûçê bigre bavê kaşan!' diwê dême werg a hêê!" Paşê kaçika paşê diwê dêma az bi qeraşikî va zewicîme!? Radiwe ku su hare, rîvi tarra pîşiyê, diwê ku da? Diwê te bi xwa negût "qeraşê beraşano mi ti kir ênîştê paşano". Rîvi diwê, xwîşka min, em birê hav in, wexta am li hav diqarên, am her tiştî hav re diwên! Ti çime dike rawe sewa wê qisa mi su hare!? Kaçika paşê e'mel dike vadigere tê mala xwa.

Rûkê rîvi rastî dimire, bin dikeviyê, kurm dikevinê lê qeraş nawêre tiştikî biwê!..

**Berhevkar: Sadiye Eser**

**Çîroka, gundê Açmeyê yê Semsûrê*
***Bi devoka gundê Açmeyê hatiye nivîsandin*





**Ji Delav**

**Feratê Dengizî**

## Sê heval

Êdî dabû qirika min.

Her sibe ku ez şiyar dibûm û min li dora xwe dinerî, ji qawîşa çil kesî encax sê-çar kesan serî radikir.

Ji veşartina meytan, taqet di çokên min de nemabû.

Li Mûşê min leşkerî dikir, Herba Ûris, yanî Herba Cîhanê nû qediyabû, li her derê tevlihevî, nebes bû îja xela derketibû. Birçîbûnê mirov kiribûn mîna heywanan, bi giha xwedî dibûn. Her der bi bêhna meytan genî bûbû. Ên dijiyan jî hestî û çerm…

Êşa Mûşê wek agirê ku bi pirêzeyan keve belav bûbû, ne zarok dihişt, ne kal, ne jin ne mêr…

Ê min pereyên min hebûn û min nanê leşkeriyê nedixwar, dikanek pîsik li navenda Mûşê, li binya kaniyê, kaniya meydanê ya serê kaş hebû. Min diçû nan, helaw, zeytûn û tiştên wisa dikirîn, jixwe tiştekî din zêde tunebû. Leşker, bi Êşa Mûşê qir dibûn.

Em sê kes bûn; ez, yekî Tepî, Tepa Barava û yekî Girikî, Girkê Izêr. Em welatiyê hev bûn. Piştî ku dewleta Osmanî bi bin ket, rê û dirba leşkeriyê jî nemabû. Ya rast rev bû. Yan jî jiyanxelasî, em ê ji mirinê xelas bibûna lê ew jî şans bû, lêhatin bû. Lewra rê jî xetere bû, talûka rûsan û ermenan, artêşa dewletê jî qaçax digirtin û ceza jî îdam... Tevayê rêbihuran girtî bûn, geliyê Bedlîsê jî di destê ermenan de bû ku em çolbir bigihana Silîva, selametî bû. Me yê xwe bigihanda çiyayê jêr, herêma xwe, herêma Surgiçiya Mêrdînê. Serhed di bin piyên biyaniyan de… Werhasil çûyin hebikî ji mayînê maqûltir bû, lewra mayîn, radestiya Êşa Mûşê bû û talî jî mirin!

Me ya xwe kir yek û şevekê lingo bi qurban, me berê xwe da başûrê Mûşê û meş… nizanim çend şev û rojan em meşiyan. Me newêribû herê şêniyan, ji ser gund û mezreyan me xwe dida alî. Lewra xelkê qaçax digirtin radestî dewletê dikirin. Carinan jî ji bo çakêtekî wan an jî qapût an gîzmeyekê ew dikuştin. Xwarina ku me bi xwe re anîbû, her çiqas me bi hesab dixwar jî, qediya, çokên me şikestibûn. Me tu der jî nasnedikir. Em hatin, hatin, hatin... ji dûr ve çemek xuyabû. Me xwe ji gir berda. Li ser çem pirek hebû, me xwe li pirê girt. Berî ku em bigihên pirê, hê em dûrî pirê ne, ji pêş çend kes dihatin, cilên leşkeriyê li wan bûn. Em tirsiyan, çekên me jî nînin. Nêzîkî li me kirin, serbazek û çend leşkerên dewletê, ew jî bêhal bûn. Me rast got; em reviyane… Me qala Êşa Mûşê, mirin, birçîtî û belengaziyê kir. Canê me tije spî û kêç bûn. Ji ber devlêkirina spiyan kortik di canê me de çêbibûn; qirik û stûyê me herifîn, spî li ser bestika me direqisîn… hêstir ji çavên serbaz hatin xwarê. Serbaz got, pir di destê emenan de ye, gundek li wî aliyî heye, keyayê wî baş e. Xwe li mala keyê, mala muxtêr bigirin, belkî hûn xelas bin, hay ji xwe hebin, de herin hûn serbest in û ji rewşa xwe hayîdar bin, Xwedê bi we re be!

Em dimeşin, lê çi meş û çi hal…

Me nêzîkî li pirê kir, bi tirs li derdorê nêrî, tu kes nedixuya. Bi xof û heft belayan em di ser pirê re derbasbûn lê çok li me şikestin. Ling li me fisiyan.

Piştî çend gavan hevalê me yê Tepî kete erdê, bangî min kir;

-Ha Kemalê Dengizî, lawo ez mirim, heqê xwe helal bikin lê ku hûn filitîn seriyekî bidin mala me. Hal hewalê min bibêjin… Min veşêrin, li van çolan nehêlin!

-Ka hêviya xwe nebire, em ê herin gund û li te vegerin.

-Ca, nizanim…

-??!!

Nizanim bi çi halî me xwe gihand gund. Şev tarî bû. Me mala keya pirsî. Hinekan berê me da mala wî. Camêr pir hurmet da me û got herin odeya me ya jorîn, cilên xwe jixwe bikin û bavêjin derve. Bila spî û kêç li malê belav nebin. Av û serşok heye, xwe baş bişon û têkevin nav livînan. Em ê cilan serê sibehê bidin we.

Hal di me de nemaye. Em man şilfûtazî, me pêşî ji hev fedî kir lê na rewş ne ya fediyê bû. Hişê min çû zarokiyê; me bi lîstika "kilor û tas" dileyîst. Lîstik a du kesan bû. Yê ku dest bida sere hevalê xwe, digot "kilor" û direviya. Ew dima heram, wî jî dida pey ê din, bera didayê, ku firsend didît îja wî ew kilor dikir û ew dima "tas" yanî helal dibû. Lîstikê werê didomand. Paşê me hev "tas" dikir, yanî em helal dibûn û lîstik diqediya. Rewşa min û hevalê min jî wisa. Bi dor me xwe şûşt û bi bêmecalî yan jî helalî(!) xwe avêt nav livînan, me xwe xist bin mitêlê. Xwedêgiravî spiyên me çûn em man paqij, ma ji xwe em çerm, çermkî kijilî bûn. Bêhnek din deng ji derî hat. Min lihêf-çi lihêf çi hal, te tayek jê bikişanda ew ê hezar pîne jê biketana- li xwe pêçand, derî vekir. Du tas mehira ceh dan min û gotin hêdî hêdî bixwin. Me ew mehîra ceh bê nan hêdî hêdî xwar an jî vexwar. Ji me re wek ava heyatê hat, wek ku ji nû ve ruh berdin bedena me. Xwarina me wek îbadetê bû. Me wek ku îbadet bikin ew mehîra ceh bi bêdengî û hurmetek giranbuha û xweşahengî xwar, me qet êrîşî mafê hev jî nekir. Paşê du tasên din. Hebikî ruh hat me. Hê hevalê me hat bîra me herduyan. Me ji keyê re got, wî got; de heta sibê Xwedê mezin e.

Bû sibe, tu nabêjî heta sibê cilên me di distan de kelandine, spî kuştine û ziwa kirine. Cil avêtin ser me û me dîsa mehira ceh xwar û me çû hevalê xwe yê bêmecal anî. Camêr ew jî mîna me têr û paqij kir, ê Tepî jî hat ser xwe. Du-sê rojan wisa em xwedî kirin. Paşê cend nanên ceh dan me, rê ji me re zelal kir û got; nanên xwe ziwa nexwin, ew ê qirika we biçire, nan nerm bikin û hêdî hêdî bixwin.

Em bi xêra wî camêrî filitîn û nemirin.

Bi rewşek riswa û heft bela me xwe gihand malê.

Paşê em man qaçaxê leşkeriyê.

Jiyanê bi teşqele, xizanî, bêçaretî, neyartî û birçîtiyê dewam kir.

Piştî çend salan em hatin ser xwe.

Qaçaxiya min a leşkeriyê dewam kir.

Jiyan bi rewşeke dinê herikî…

# Dengvedana teqîna Libnanê didome

Piştî teqîna li paytext Beyrûd Libnanê, gotûgoyên der barê hebûn û bandora xirab a Hizbulahê ya li Libnanê zêde bû. Bi taybetî jî piştî nûçeyên didan xuyakirin ku li wê bendergeha teqîn lê pêk hat, desthilatiya Hizbulahê hebû û di bin kontrola wê de ye. Her wiha goftûgoyên der barê krîza aborî ya vî welatê de zêde bûn.

Wezîrê Karên Derve yê Amerîkayê Mike Pompeo jî tev li van guftûgoyan bû û da xuyakirin ku dadgeha Lahey a navneteweyî yek ji endamên Hizbulaha Libnanê bi kuştina serokwezîrê berê yê Libnanê Refîq Herîrî tawanbar kiriye.

Wezareta Karên Derve ya Amerîkayê da xuyakirin ku tewanbariya Selîm Ayaş ku endamekî Hizbulahê ye, tê wê wateyê ku Hizbulah rêxistineke terorê ye û armanca wê pêknîna berjewendî û daxwazên rejîma Îranê ye. Her wiha got ku Hizbulah parastina Libnanê nake lê ew rêxistineke terorê ye. Di heman çarçoveyê de Pompeo da zanîn ku bikaranîna Hizbulahê ya pergala malî, rewşa krîza aborî ya Libnanê wêrantir dike.

Wekî tê zanîn di rojên borî de dadgeha navneteweyî ya taybet bi doza Libnanê der barê kuştina Refîq El Herîrî de ku di sala 2005'an de hatibû kuştin, Selîm Ayaş tawanbar kir ku ew yek ji endamên Hizbulaha Libnanê ye. Her wiha der barê vê mijarê de Parlementoya Erebî jî kêfxweşiya ji bo biryara dadgeha navneteweyî nîşan da û daxwaz kir ku kesê tawanbar were radestkirin bo dadgeha navneteweyî û parlametoyê bang kir ku divê çek tenê di destê dewletê de be û ji destê hemû rêxistinan derkeve ji bo aramiya Libnanê. ***BEYRÛD***



Teqîna Beyrûdê ya li bajêr bû sedema wêraniyeke mezin, goftûgo û nakokiyên krîza aborî û siyasî jî gurtir kirin, bi taybetî jî piştî sûcdarkirina Hizbulaha Libnanê ya bi kuştina Refîq Herîrî

# Peymana Îsraîl-Îmaratê û nerazîbûna Tirkiyeyê

Dildarê Amedê

Gelek nav li peymana di navbera Îsraîl û Îmaratên Erebî de hatin kirin. Hinekan got xiyaneta doza Filistînê ye, hinekan got peymaneke dîrokî ye, hinekan got dê neyê pejirandin û hinekan jî ew ji xwe re wekî hinceteke bi kar anî ku bi navê parastina doza Filistînê ji xwe re hestên neteweyî bifiroşin gelê Filistînê lê di bin mase û odeyên reş û tarî de yên herî zêde têkiliyên wan bi rengekî veşarî bi Îsraîlê re hene jî ew in.

Wekî tê zanîn ji ber sekna welatên ereb a bi gelê Filistînê re welatên ereb hema bêje tevan têkilî bi Îsraîlê re danetanîn. Hin têkiliyên hebûn jî bi rengekî veşarî bûn.

Piştî peymana aştiyê ya di navbera Îsraîl û Misrê de, di sala 1979'an de û peymana 1994'an a bi Urdunê re Îmaratên Erebî wekî delweta sêyemîn ku têkiliyên xwe bi Îsraîlê re sererast dike. Her wiha ew dewleta yekemîn a welatên Kendavê ye ku têkliyê bi Îsraîlê re datîne. Piştî vê peymanê niha bi welatên din ên Kendavê re diyalog ji alî Îsraîlê ve bi wan re jî tên kirin.

Ji ber zêdeyî salekê hevdîtinên veşarî di navbera Îsraîl û Îmaratê de dihatin kirin lê ew hevdîtin û diyalog veşarî man heta ku serokê Amerîkayê beriya demekê behsa vê peymana di navbera her du welatan de kir.





Li gorî çavdêrên siyasî sedemeke sereke li pey lidarxistina peymaneke wiha, metirsiya ji Îranê ye ku her diçe cihê xwe di Rojhilata Navîn de berfirehtir dike û ji bo herêmê û welatên Kendavê dibe metirsiyeke mezintir. Armanc ew e ku bi rêya peymanên wiha rê li ber timayî û dandora zêde ya Îranê were girtin.

Ji ber ku Îranê destê xwe dirêjî nav kar û barên gelek dewletên Rojhilata Navîn dike.

Wekî tê zanîn her çend tevgerên siyasî yên Filistînê nerazîbûna xwe bînin ziman jî dibe ku were fêmkirin û normal were dîtin lê li gorî çavdêrên siyasî nerazîbûna herî bê wate ya Tirkiyeyê ye. Ji ber ku li hemû herêmê welatê herî zêde ku têkliyên wê yên siyasî û aborî bi Îsraîlê re hene Tirkiye ye. Çavdêr dibêjin nerazîbûna Tirkiyeyê ji ber wê yekê ku ew naxwaze ti şirîkên wê yên din hebin di têkliya bi Îsraîlê re. Ji bo ku her tim Îsraîlê di hemû mijarên berjewendiyên xwe yên li Rojhilata Navîn de hewcedariyê bi Tirkiyeyê bibîne.

Ev nerazîbûn ne wekî ku dibêjin ji ber ku dilê wan bi ser doza gelê Filistînê ve ye lê di rastiya xwe de ji ber ku ew dixwazin li herêmê tenê ew delaliyê li ber dilê Îsraîlê be. Her wiha ditirsin ku heke têkiliya Îsraîlê bi welatên din ê herêmê re çêbibe, wê gavê tu girîngiya wan ji bo Îsraîlê namîne. Lewre jî em dibînin ku nerazîbûnên herî tund ên li dijî vê peymanê ne desthilata tirk e.

# Bazirganiya şerê Lîbyayê

Navenda Nûçeyan

Di demên dawî de piştî peymana ji bo lêgerîna petrolê û parvekirina ava deriyaya Spî bi Lîbyayê re, niha jî peymaneke ku rê dide bazirganên tirk û şîrketên wê de ku li Lîbayayê kar bikin, di navbera hikûmeta tirk û rêveberên partiya Wîfaq ya Îxwanan de pêk hat.

Li gorî vê peymana ku di 13'ê meha borî de hate kirin dê rê li ber zêdeyî 100 şîrketên Tirkiyeyê veke ku karên binesazî û îhaleyên di sektora avahîsaziyê de kar bikin. Her wiha dê zirarên ku li şîrketên tirk bûye li wan were vegerandin, Ew şirketên ku di sala 2011'an de ji ber şer û pevçûnan Lîbayayê terk kiribûn. Li gorî tê gotin bi vê peymanê bi giştî dê şîrketên tirk derdora 35 milyar dolar kar bikin.

Li gorî nûçeyên ku ji çavkaniyên herêmî yên Lîbayayê jî tên, nakokiyên mezin di navbera çekdarên hikûmeta Wifaq a Îxwanan û çeteyên ku ji Sûriyeyê hatine veguhastin bo Lîbayayê her diçe zêdetir dibin. Di vê der barê de yek ji rêveberên çekdarên misratayê Frec Mistefa Xelîl rexneyên tund li çekdarên ku dewleta tirk ew ji Sûriyeyê birine kir û da xuyakirin ku her diçe desthilata wan zêde dibe û ji kontrola wan derdikevin. Xelîl di berdewamiya axaftina xwe de wiha dibêje; "Ji gemara li Sûriyeyê hebû bi ser me de anîne."

**Bila biyanî derkevin**

Li aliyekî din, serokê lijneya karên derve yê parlementoya Lîbayayê Yusuf El Eqûrî da xuyakirin ku ew bi biryarên Kongreya Berlînê ne ya ji bo çareseriya siyasî. Her wiha teqez kir ku divê hemû komên çekdar û hêzên biyanî ji Lîbayayê derkevin. El Eqûrî da xuyakirin ku tiştê girîng ew e, em bala xwe bidin aramî û yekitiya axa Lîbayayê.

Her wiha serokdewletê Misrê Abdulfetah El Sîsî di nameyekê de ji serokê artêşa neteweyî ya Lîbayayê Xelîfe Hefter re got ku welatê wî dê li kêleka artêşa neteweyî cih bigire û alîkariya wan bike da ku Lîbaya neyê parçekirin û rêyeke çareseriya siyasî were peydakirin.



*Mem Avba*

# Hilbijartinên Amerîkayê û kurd!

Piştî qeyraneke mezin a cîhanî 'zilhêzê cîhanê' Amerîka hilbijartinê pêk tîne. Amerîka di cîhana bûyî du enî de, yek ji serkêşê vê pergala qeyranî ya dewletger e. Lewre hatiye wê rewşê ku gaveke wî ya biçûk ji cîhanê eleqedar dike. Êdî siyaseta hundir û derve ya Amerikayê nemaye. Siyaseta hundirîn, rasterast di bin bandora stratejiya derve de tê kirin û di warê siyasî, civakî, leşkerî hwd. de çi gav bên avêtin, li gorî van dibetî û hesaban tên avêtin. Lewre siyaseta hundir êdî rasterast cîhanê eleqedar dike, çimkî bivê nevê bi awayekî (erênî-neyînî) bandor lê dike.

Amerîkaya ku qaşo ji derve de xwe weke navend û 'parazvanê herî radîkal ê demokrasî û azadiyan' bide nasîn jî di hundirê xwe de li ser du enî û aliyan tê rêvebirin: Eniya Demokratan û Eniya Komarparêzan… Piranî heta niha welat ji aliyê van her du ferasetan ve hatiye birêveberin.

Rewşa li ber çavan wiha be jî di rastiyê de kî bê ser desthilatdariyê bila bê, siyaseta dewleta Amerîkayê ya 'neteweyî' heye û neçar e li gorî wê tevbigere. Yanî kîjan alî jî bê, xweyî çi hişmendî û perspektîfa bîrdozî be jî nikare derkeve derveyî siyaseta stratejîk a Amerîkayê. Cêwazî û cudatiyên wê yên biçûk pêk bên ji piranî sedsalan carek siyaseta Amerîkayê diguhere, ango her tim 'aqilê kûr û tarî' yê dewletê xwedî siyaset û stratejiyeke demdirêj e; tenê kesên tên ser desthilatdariyê di rêbazan de xwedî înîsiyatîf û kiryar in…

Ev ne razek e ku Amerîka, hema bêje ji destpêka avabûna xwe heta niha di bin bandor û arastebûna kûr a lobiya cihûyan de ye. Ya li siyaseta DYA'yê ango bandor li siyaseta cîhanê dike û wê araste dike ev feraset û aqil e! Jixwe tê zanîn ku netewe-dewlet berhemeke vî aqilî ye ku heta niha jî parazvaniyeke kûr a vê pergalê dike.

Heke em bên ser mijara têkilî û pêwendiya Amerîka û kurdan; her çiqas Amerîka sed sal in kurdan bizane jî nêzî nîv sedsal e bi wan re di nav têkilî û nakokiyê de ye! Heke em ji dîroka nêz bigirin dest, di şerê tevgera azadiyê yê li dijî dewleta tirk de ku endamekê NATO'yê ye, Amerîka bi kurdan re di nav nakokî û pêwendiyan de ye. Ji destwerdana DYA'yê ya li Iraqê ev pêwendî li ser başûrê Kurdistanê zêdetir bûn. Bi pêvajoya 'Bihara Gelan' a Sûriyeyê re jî ev pêwendî û têkilî kûrtir û piralî bûn. Cara yekemîn bi şoreşa Rojava re têkiliyên kurdan û Amerîkayê ne li ser dagirkerên Kurdistanê re, ji têkiliyên dewletan derbas kir û bû 'meseleyeke navxweyî' ya Amerîkayê, bandor li siyaseta wê ya hundirîn jî kir.

Cara yekemîn e kurd dibin aktorekî bi bandor ê siyaseta navxweyî ya Amerîkayê, zimanê beşeke siyaseta Amerîkayê ne li gorî serdest û dagirkerên Kurdistanê ye, piçek jî be zimanekî 'dilxweşkirina kurdan' tê bikaranîn. Baş e çima?

'Kurdan di şerê li dijî DAIŞ'ê de, di serî de gelên DYA'yê sempatiya hemû gelên cîhanê girt, vê jî hişt ku hemû dewlet li hemberî kurdan siyaseta xwe di ber çav re derbas bikin!' Destpêkê ev bersiveke maqûl bixuyê jî nikare bi vê re bê sînordarkirin. Çimkî hest û aqilê civakan cuda, yê desthilatdaran cuda dixebite. Bêguman bandora wê heye lê belê heke wisa bûya hê jî DYA, di şerê Tevgera Azadî û Tirkiyeyê de alîkariya herî mezin a teknîk, îstîxbarati, çek û cebilxane hwd. nedida 'hevkarê xwe yê stratejîk' dewelata tirk!

Dîsa dema hikûmeta başûrê Kurdistanê biryara referandûma serxwebûna başûrê Kurdistana dayî, yên destpêkê piştgirî dayî û ew teşwîq kirî DYA, Îsraîl û Tirkiye bûn lê paşê çi bû? Bi provakasyona çêkirî re ji nîvî zêdetir axa Kurdistanê ji destê kurdan derket û ket destê Iraqê. Li rojavayê Kurdistanê mînakên ji Efrînê heta Serêkaniyê, heta Girêspî mînakên şênber ên vê nêzikatiyê bûn.

Bi kurt û kurmancî kurd xwedî wî aqil û ferasetê ne ku bi çend gotinên xweş paşerojê ji bir nakin. Ya duyemîn kurd niha jî çar aliyan ve di dorpêça qirkirina etnîkî, çandî, erdnîgarî re rû bi rû ne û li hemberî vê berxwedaneke bêhempa li dijî vê qirkeriyê, bi hêza xwe didin. Heke ev aqilê kûr ê siyaseta Amerîkayê ewqas azadîxwaz e, parazvanê mafê mirovan e, bila li hemberî vê hovîtiyê bibe xwedî helwest û kiryarekê! Kurd neyarên xwe ji hogirên xwe baş nas dikin! Bi çend gotinên ji bo neyarên wan hatî gotin, kes nikare kurdan bike amûrê berjewendiyên xwe.

# Dixwestin Hesekê ji tîna bifetisînin

Navenda Nûçeyan



Bi kedeke mezin û piştî tîhiştina bajarê Hesekê ya çend rojan Rêveberiya Xweser ev pirsgirêk çareser kir û di demeke nêz de dê av bigihîje hemû taxên bajarên Hesekê

Ev demek e dîsa delweta tirk û komên girêdayî wê, ava vexwarinê ji ser bajarê Hesekê birîne û xelkên bajêr û derdorê wê di rewşeke gelekî zehmet de hiştine. Bêguman ji dema ku Tirkiyeyê di 9'ê cotmeha 2019'an de, piştî ku Amerîkayê beşek ji hêzên xwe ji hin navçeyên sînorî yên rojavayê Kurdistanê vekişand, êrîşî rojavayê Kurdistanê kiribû û bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî li gel bi dehan gundên derdorê xwe ketin destê artêşa Tirkiyeyê û komên çete yên girêdayî wê.

Piştî wê jî gelek caran qutkirina avê wekî beşeke ji şerê taybet ê li dijî gelê rojavayê Kurdistanê tê meşandin. Cara pêşî di 24'ê sibatê de ava stasyona Elok ji ser Hesekê, Til Temir û çend navçeyên din qut kiribû.

Piştî wê jî di 21'ê adara 2020'an de dîsa duyemîn car, artêşa Tirkiyeyê û komên çekdar stasyona Elok ji kar xistin û av li ser bajarê Hesekê û çend deverên din birîn.

Piştî qutkirina ava sentrala Elok li rojhilatê bajarê Serê Kaniyê ji aliyê Tirkiyeyê ve, Fona Alîkariya Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (UNICEF) li ser mijarê daxuyanî da û ragihand ku qutkirina avê zarok û malbatên wan dixe xeteriyeke ku nayê qebûlkirin.

Di demekê de ku bi sedema eger û tirsa belavbûna virûsa koronayê, pêwîstiya xelkên rojavayê Kurdistanê bi giştî, di nav de jî xelkê Cizîrê, bi ava pak heye, hikûmeta Tirkiyeyê û komên çete yên alîgirên wê, qutkirina avê weke zextekê li ser xelkê navçeyên Cizîra rojavayê Kurdistanê bi kar tînin.

**Armanc çi bû**

Armanca sereke ya vê yekê ew e ku gelê herêmê li dijî rêveberiya xweser bi kar bîne û bi xelkê bide nîşankirin ku ev rêveberî nikare xizmetan ji gel re pêşkêş bike. Ji aliyekî din ve jî dixwaze ku gelê herêmê yê ku tevî hemû zor û zehmetiyan dest ji cih û warê xwe bernedan û tevî hêzên xwe yên parastinê li hember hemû êrîşan li ber xwe dan ceza bike. Rêveberiya Xweser ku bi salan e li hemberî êrîşên hovane yên li ser herêmê gelê xwe parastiye û di rewşa Sûriyeyê ya zor û zehmet de heta niha hemû hewcedariyên gelê herêmê pêk aniye. Niha ji bo astengikirina kar û barê wê ev pirsgirêka avê jê re peyda kirine û dixwazin ku berteka gelên herêmê li hemberî vê rêveberiyê sor bikin.

**Av ji ku dihat**

Hêjayî gotinê ye ku stasyona Elok, bi nêzîkî 10 kîlometreyan dikeve rojhilatê bajarê Serê Kaniyê, û çavkaniyên ava wêstgehê, 30 bîrên irtiwazî ne.

Di sala 2013'an de ew stasyon hatibû avakirin û rojane 175 hezar metre kabik ava vexwarinê dida, lê niha di bin destê Artêşa Tirkiyeyê û komên çekdar ên alîgirên wê de ye. Berî ku Tirkiye herêmê dagir bike bêhtirî  milyon kesî  ji wê avê sûdwerdigirt.

**Bersiva herî xweş çareserî bû**

Ji bo peydakirina jêdereke nû ya ava vexwarinê, Gerînendeya Avê ya Kantona Hesekê dest bi projeya kolandina bîran a li Himeyê kiribû.

Di çarçoveya projeyê de 50 bîr hatin kolandin. Ji destpêka vê mehê de (Tebax) 5 bîr ketin xizmetê û îro 20 bîrên din jî hatin şixulandin.

Hevseroka Gerînendeya Avê ya kantona Hesekê Sozdar Ehmed diyar kir ku di dema bê de wê 25 bîrên din bikevin xizmetê. Her bîrek di saetekê de 20 mitre kabik av dide.

Sozdar destnîşan kir ku di nava du rojan de wê av bighêje taxan û got: "Ji ber cara yekem ev bîr tên xebitandin destpêkê dê av  nezelal be. Lê piştî du rojan wê av zelal bibe û ji bo vexwarinê dê guncav bibe."

Sozdar Ehemd diyar kir ku di qonaxa yekemîn de wê her 10 rojan av bighêje taxekê, piştî xebitandina hemû bîran dê her roj dayîna avê zêde bibe.

Di merasîma xebitandina bîran de, endama Desteya Serokatîya PYD'ê Foza Yûsif û hejmarek endamên Rêveberiya Xweser a Herêma Cizîrê amade bûn.

---

# Li Zaxoyê xwepêşandan

Beşek ji welatiyên navçeya Zaxo Duhokê li dijî biryara rêdana derbasbûna şofêr û wesayîtên barhilgir ên Tirkiyeyê nava Herêma Kurdistanê şeva borî xwepêşandan kirin.

Şeva borî li navçeya Zaxoyê beşek karker û welatiyan li dijî biryara ku rê dide şofêr û barhilgirên li deriyê Sînor ê Îbrahîm Xelîl re derbasî Herêma Kurdistanê bibin xwepêşandan kirin. Li gorî welatiyên Zaxoyê ev biryar dibe sedema bêkarmayîna bi hezaran şofêrên Herêma Kurdistanê. Li gorî berê kamyonan barê xwe digihandin heta sînor û li sînor bi kamyon û barhilgirên Herêma Kurdistanê dihatin veguhastin bo deverên din ên herêmê.

Li aliyekî din, di rojên dawî de li parêzgeha Duhokê, xalên kontrolê hatine zêdekirin. Ev jî di nav welatiyan de bûye cihê fikaran. Li gorî agahiyên ku me ji herêmê bidest xistine, Partiya Demokrat a Kurdistanê ji tirsa nerazîbûna xelkê Behdînanê ya li dijî desthilatê, nedana mûçe û xizmetguzariyê, xalên kontrolê li herêma Behdînanê zêde kirine. Heman çavkaniyan ragihand ku êdî bi awayekî rasterast gef li wan kesên ku di torên civakî de desthilatê rexne dikin û banga xwepêşandanan dikin tê xwarin. ***DUHOK***

# 'Divê gelê Başûr xwe birêxistin bike'

Botan Germiyanî

Çavdêrê siyasî Nebez Xalid destnîşankir ku dewleta tirk berî li ser xaka başûrê Kurdistanê dest bi êrîşa leşkerî bike, di warê aborî, siyasî, çandî û perwerdeyê de başûrê Kurdistanê dagir kiribû. Nebez Xalid got, divê gel li benda desthilatê nemîne û li dijî dagirkeriyê xwe birêxistin bike.

**'Heftanîn ne destpêk e '**

Çavdêrê siyasî Nebez Xalid da zanîn şerê ku niha li Heftanînê heye û dagirkeriya ku dewleta tirk rojane li ser başûrê Kurdistanê dimeşîne, ne destpêka dagirkeriyê ye û wiha got: "Ji beriya destpêkirina êrîşa leşkerî, bi rêya aborî, siyasî, perwerde û bazirganiyê her wiha avakirina baregehên sîxurî û leşkerî başûrê Kurdistan hatibû dagirkirin."

**'Xeta pêşî parastinê dike'**

Di dewamê de Xalid Nebez balkişand ser berxwedana gerîla ya li dijî dagirkeriya tirkan û wiha domand: "Ya ku niha li dijî dagirkeriya tirkan li ber xwe dide xeta berxwedaniyê ye. Ev xet rasterast parastina başûrê Kurdistanê dike. Dijminên vê xeta berxwedaniyê jî rasterast alîkariya dewleta tirk dikin. Metirsiya vê dagirkeriyê li pêş çavê cihanê ye lê ji vê metirsîdartir ew e ku welatên serdest û civaka navneteweyî ji vê dagirkeriyê re bêdeng dimînin."

**'Daxwaz Misaqî Milî ye'**

Nebez wiha pê de çû; "Dewleta tirk xizmetê ji projeya îxwanî re dike. Dixwaze bandora îxwantiyê li ser herêmê bide ferzkirin û împaratoriya Osmaniyan zindî bike. Dixwaze bi zindîkirina Misaqî Milî wîlayeta Mûsil bixe jêrdesthilata xwe."

**'Avakirina parastina cewherî'**

Nebez Xalid desnîşan kir ku xwe birêxistin kirin û avakirina hêza parastina cewherî dikare bibe bersiveke xurt ji bo dagirkeran û wiha got: "Mînaka vê jî rojavayê Kurdistanê ye lê mixabin gelê başûrê Kurdistanê heta radeyekê bêxem e li beramberî êrîşên li ser Heftanîn û başûrê Kurdistanê tên kirin. Sedema vê yekê jî medyaya ser bi desthilatê ye ku rastiyan weke heyî nîşanî gel nadin. Di demekê de ku dewleta tirk welatiyên me qetil dike, kerameta me dixe bin lingên xwe, gundên me wêran dike û axa me dagir dike, gelek bê şermane dibêjin sedem PKK ye."

**'Divê gel xwe birêxistin bike'**

Çavdêrê siyasî Nebez Xalid da zanîn ew ji desthilata Başûr bê hêvî ye û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Divê gelê Başûr fêm bike ku desthilata li başûrê Kurdistanê heye, ne di berjewendiya gel de ye. Hikûmetek xwemalî ku di berjewendiya gel de be nîne. Ji bo wê derî vekirî maye, her roj dewletek yan jî hêzek cuda êrîşî Başûr dike. Ji bo wê divê gel xwe bi rêxistin bike, parastinê bike û daxwazê ji hikûmetê neke."



# Armanc petrol e Sûriye hincet e!

Nazim Daştan

Peymana petrolê ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi Amerîkayê re îmze kir, îhtîmal heye ku statuyê bi xwe re bîne. Rûsya, Îran, Tirkiye û rejîm bi awayekî aşkera ji petrolê par dixwazin.

Dengvedana peymana petrolê ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, bi şîrketa petrolê ya Delta Crescent Energyê ya Amerîkayê re îmze kir, didome. Piştî ragihandina peymanê ya ji raya giştî re Rûsya, Îran, Tirkiye ku li Sûriyeyê ne û rejîmê dijberiya xwe ya li hemberî peymanê aşkera kirin. Heman hêz, li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tevliheviya navxweyî derdixin.

**Peymana petrolê**

Wê bandora peymana ku rêveberiya xweser îmze kiriye, hem li herêmê hem jî li qada navneteweyî çêbibin. Tê payîn ku destpêkê peyman bandorê li nasîna fermî ya Rêveberiya Xweser a navneteweyî bike. Piştî peymanê tê plankirin ku bi biniqik parzûngehên petrolê bên herêmên Rimêlan û Dêra Zorê. Di vê derbarê de demek neyê diyarkirin jî xebatên ji bo vê yekê didomin. Dîsa tê gotin ku ji bo pêkanîna peymanê rayedarên şîrketê hatine Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û bi Rêveberiya Xweser re hin hevdîtin kirine.

**Dijberên petrolê**


Tê payîn ku di rojên pêş de hûrgiliyên peymanê bi raya giştî re bên parvekirin. Rûsya, Îran, Tirkiye ku li Sûriyeyê ne, li dijî peymanê derketin. Rejîm jî di lîsteya dijberî peymanê de cih digire. Tê diyarkirin ku hêzên din dixwazin bi ser Rejîmê re peymanê hilpekînin. Hêzên navborî ji bo têkbirina aramiya li herêmê di nav hin heldanan de ne.

**Şîrketên gazê yên Rûsyayê**

Tê zanîn ku Rûsya dixwaze li herêmên petrol û enerjiyê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê serwer bibe. Rûsya ku heta niha dixwaze hem bi rêya leşkerî hem jî bi rêya siyasî vê yekê pêk bîne, bi ser neketiye. Piştî peymana petrolê ku di navbera Rêveberiya Xweser û şîrketa amerîkî de hat îmzekirin, Rûsya dîsa ket nav liv û tevgerê û dixwaze şîrketên xwe yên petrol û enerjiyê bişîne herêmê.

**Herêmên ceyran û gazê**

Rûsya bi vê armancê bi Rêveberiya Xweser re hevdîtinan dike û tê destnîşankirin ku şîrketên Rûsyayê bi taybetî dixwazin bên herêmên bigaz. Ev herêm jî di serî de xeta Konîko ya Dêra Zor û Hesekê ye. Her wiha tê diyarkirin ku di serî de ceyran ji bo herêmên din en enerjiyê jî cihên mîna Reqa û Tebqayê tên fikirîn. Tê gotin ku der barê mijara de ku wê rojên pêş zelaltir bibe hin welatên Ewropayê jî xwestine bikevin dewrê. Her wiha tê payîn ku şîrketên enerjiyê yên amerîkî û rûs ku bên herêmê, armanca wan tenê ne derxistina petrolê ye, di heman demê de dixwazin berpirsyariya bajarên ku ji ber şer wêran bûne jî carake din ava bikin jî bigirin ser xwe.



## Berhemên ruhê xwebûnê -3

# Mîr Bedirxan

**Abdurrahman Sever**

Cizîra Botan...Herêmeke bêhempa. Herêmeke qedîm, xelata Mezopotamyayê, strîngeha keştiya pêxamberan, navenda evînên giranbuha, welatê Mem û Zînên nemir û dildarê Dîjleyê...

Li ser çemê Dîjleyê jî cotek çavreş ên xort, jîr, zana, wêrek û qelender; ortekî aborînas, sîyasetmedar, rêzdar û xwedan fikrên nû û pêşketî; xortekî dildarê welatê xwe û evîndarê Mezra Botan: Mîr Bedirxan...

Mîr Bedirxan, di sala 1803'yan de li Cizîrê tê dinê. Kurê Mîr Evdilla ye. Hê di zaroktiya xwe de ruhê pêşengiyê di kesayeta xwe de dihewîne. Jixwe Mîrtiyê jî, ji çelengiya kekê xwe yê mezin digire. Ya rast kekê wî Salih beg, ji bo mîrtiyê xwe têr nabîne û bi rûspiyên eşîrê dişêwire û birayê xwe Mîr Bedirxanî layiqê Mîrtiya Botanê dibîne û dide wî.

Mîr Bedirxan di pêvajoyeke qeyran û aloziyê de derbasî mîrtiyê dibe. Alozî him di nav civak û eşîran de heye him jî di navbera mîrtî û hikûmeta Osmaniyan de heye. Mîr Bedirxan hê pir ciwan e. Hêza wî ya çareserkirina pirsgirêkên navxweyî û derve, wê gavê nîn e. Lê di nav demeke kurt de bi pêngavên encamgir yek bi yek pirsgirêkan çareser dike. Ji aboriyê hetanî perwerdeyê; ji çandiniyê hetanî bazirganiyê; ji leşkeriyê hetanî siyaseta giştî, bi politikayên rast, durist û biedalet pêşketineke mezin çêdike û him di nav tevahiya welat de him jî di qada navneteweyî de deng dide. Ji zarokên welêt hetanî mezinên derveyî welêt, hezkirin û rêzdariyeke mezin dibîne. Ên bêwar û bêwelat mane, xwe diavêjin Botanê. Ên di bin zilm û zordariyê de ne, xwe dispêrin Mîr Bedirxan. Hemû ol, bîr û bawerî û netewe, xwe bi reng û dengê xwe ve bi awayekî azad, li Botanê û di rêveberiya Mîr de dikarin bijîn. Cizîra Botan û qadên Mîr Bedirxan, di nav çend salan de dibe cihê herî ewle, cihê herî pêşketî, cihê herî navdar. Her wiha, lêkolîner û nivîskarê Rus V. Dittel, di nivîsa xwe ya sala 1843'an de ji bo Mîr Bedirxan, wek pêşeng û rêberekî herî zana, pêşketî, biedalet û rêzdar; ji Botanê jî wekî cihekî herî ewle, xweş, binîzam û bipergal behs dike.

Mîr Bedirxan, bi pirsgirêkên kurdan û sedema têkçûna serhildanan jî baş dizane. Ji ber vê yekê giraniya xebatên xwe dide ser aborî û qeyrana navxweyî. Ji bo aboriya xweser û serbixwe gelek xebat dide destpêkirin. Di karê çandinî û cotkariyê de plansaziyekê çêdike. Bacê li gor pêdivî û dewlemendiyê saz dike. Li ser gola Wanê, ji bo kargiriya keştiyan xebatekê dide destpêkirin û rêya bazirganiya li welêt berfireh dike. Dewlemendiya bin axê jî derdixe holê û karê madenê bi pêş dixe û hêdî hêdî fabrikayan ava dike. Him ji bo kargirî û karmendiya keştiyan him jî ji bo çêkirina çek û barûdê gelek xwendekar jî dişîne Ewropayê. Di her alî de pêşketinên bingehîn û modern pêk tîne. Li aliyê din jî, ji bo aloziyên navxweyî, bi eşîr, civak û bajarên dûr re jî têkiliyên baş bi pêş dixe. Ji bo yekitiya neteweyî tifaqên xurt çêdike û bi esaleta xwe û tevgerên xwe yên bipîvan, bi exlaq û bi edaletê jî qebûlî û rêzdariyeke mezin dibîne. Piştî evqas geşedanan Mîr Bedirxan êdî ne tenê Mîrê eşîr û Botanê ye, di heman demê de pêşeng û pêşawayê tevahiya welat û kurdan e.

Di vê pêvajoyê de rewşa hikûmeta Osmaniyan jî ne baş e. Bi rûsan û Misirê re şer li ber derî ye. Osmanî, ji bo xurtkirina hêza xwe, polîtîkayên navendparêzî demek dirêj e kirine meriyetê. Eşîr, xweserî û otonomiyan belav dikin û dixwazin hemû hêzên leşkerî û aboriyê di navenda hikûmetê de kom bikin. Wek her carê, ji ber paşveçûyîna xwe, vergî, leşker û îtaet zêde ji kurdan dixwazin. Mîr Bedirxan jî ji bo xebatên wî asteng nebin, ji bo cara dawiyê leşker ji hikûmetê re dişîne.

Di sala 1839' an de artêşa Osmaniyan û Misirê tên beramberî hev. Leşkerên Mîr jî li aliyê Osmaniyan in lê artêşa Osmanî li hember hêza Misirê têk diçe. Mîr Bedirxan jî leşkerên xwe paşve dikişîne tîne Amedê bi cih dike. Piştî têkçûna Osmaniyan, Mîr Bedirxan biryara xwe ya leşkerneşandinê û nedayîna bacê ji hikûmetê re radigîhîne. Mîr Bedirxan ji bo azadiya welatê xwe agahî dişîne her derê. Di vê navbêrê de bi fesadiya îngilîzan, Nastûriyên Colemêrgê Mîrtî û serxwebûna Mîr Bedirxan nasnakin û di navbera Mîr û Nastûriyan de şerekî dijwar diqewime. Nastûrî zaiyateke mezin didin û paşve gav diavêjin lê dewletên Ewropayê vê yekê dikin hincet û ji bo kuştina Bedirxaniyan nîşe didin hikûmeta Osmaniyan.

Mîr Bedirxan jî xebatên xwe yên demdirêj gelek pêş xistiye. Ji bo yekitiya neteweyî tifaqên berfireh çêkiriye. Hikûmeta Osmaniyan jî naxwaze bi artêşa Mîr Bedirxan re şer bike. Gelek caran elçî dişîne gel Mîr Bedirxan lê belê biryar û armanca Mîr zelal e. Her tişt ji bo azadî, serxwebûn û berhema ruhê xwebûnê amade ye. Osmanî dixwazin tifaqa kurdan ji hev bixin û parçe bikin lê têr nake. Mîr Bedirxan ser navê xwe pere derdixe, xutbe dide xwendin û qada serxwebûnê ji Mûsil, Rewanduz, Sebleh û Wanê, hetanê girê Sor, Wêranşar, Sêrt û Şengalê fireh û mezin dike.

Li ser evqas geşedanan Osmanî, di meha hezîrana 1847'an de bi artêşên mezin, du-sê aliyan de ber bi Kurdistanê ve dimeşin. Îngilîz jî cî bi cî alîkariyê didin Osmaniyan. Lê dîsa jî li gelek cihî bi artêşa kurdan nikarin û têk diçin. Li Wan, Amed, Sêrtê şervanên kurd dîrokekê dinivîsin. Mîr Bedirxan jî bi jîrî, wêrekî û jêhatîbûna xwe kel bi kel digere û şer dike. Heybeta wî sekna wî û awirên wî yên bi hêvî û tijî îrade, ruh û bawerî dide şervanan. Paşayên Osmaniyan jî ji bo hêzên xwe xurt bikin bi fitne û fesadiyê, bi pereyan û bi statuyên şexsî hinek mezin û pêşengên eşîran dixapînin. Di şerekî pir mezin de biraziyê Mîr Bedirxan, Yêzdanşêr (Îzzettîn) ji bo îqtîdar û berjewendiya xwe ya şexsî, bi soza walîtiya tevahiya Kurdistanê, ber bi îxanetê ve diçe û bi leşkerên xwe ve tev li artêşa Osmaniyan dibe û li hemberî apê xwe û li hemberî azadiya welatê xwe şer dike. Yêzdanşêr bi artêşa Osmaniyan re dikeve Cizîrê lê Mîr Bedirxan ronahiya çavên xwe ji wan re nahêle û careke din bajarê Cizîrê ji destên wan rizgar dike. Hêzên Mîr Bedirxan hêdî hêdî lewaz dibin û di demeke kurt de gelek bajar ji dest derdikevin. Mîr Bedirxan bi malbat û leşkerên xwe yên mayî re derbasî kela Dihê dibe. Li vir jî berxwedaneke mezin dide. Nêzî du mehan kela Dihê him dorpêçkirî him jî di bin bombeyên taybet de dimîne. Mîr Bedirxan û koma wî bêerzaq û bêçek dimîne û bêçare teslîmê Osmaniyan dibe.

Piştî serhildan û şerê Mîr Bedirxan, tevahiya malbata Bedirxaniyan mişextê Stenbolê dibin. Piştre jî bi polîtîkayên tecrîdê Mîr Bedirxan mişextî girava Girîtê tê kirin. Demên xwe yên dawiyê jî, li ser xwesteka xwe li Şamê derbas dike. Her çiqas ji welêt dûr mabe jî, dizane ku şoreşa ewil di jiyan û kesayeta mirovan de dest pê dike. Ji ber vê yekê zarok, heval û hogirên xwe her tim bi kurdewariyê mezin dike da ku ruhê azadiyê her zindî be.

Agirê serhildan û şerê Mîr Bedirxan li vir naqede. Jîndarkirina ruhê azadiyê, bi tevgera Mîr Bedirxan ve xwe digihîne asteke bilind. Êdî, di her kêliya jiyana kurdan de tu tiştek wekî berê nabe. Ruhê xwebûnê her roj pîvana xwe mezin dike û di her beşa jiyan û cîvakê de xwe nîşan dide. Serhildanên Bedirxaniyan dê bidomin...



# Morîka xewê

**Ciwan Qado**

Destaneka gelerî ya almanan heye bi navê "Siebenschläfer" e, ango heftxewok. Li gor wê heger di 27ê meha hezîranê de baran bibare dê heft heftêyan ser hev baran bibare. Têkiliya vê destanê bi çîroka heftxewokên efsanewî yên şikefta Ephesusê re heye. Ehlên şikeftê li gor baweriya misilmaniyê, 27'ê hezîrana 446'an a piştî zayîna Îsa pêxember her heft lehengên şikeftê piştî razana "195" salan an "309" salan li gor di Quranê de hatiye, ji nişkan ve ji xew şiyar dibin. Di wê rojê de xwedêgiravî baran ji erd û ezmanan dibariya, şivanekî xwestiye bi pezê xwe re ji ber baranê xwe bavêje şikeftê loma morîka xewê ji guhên ehlên şikeftê sûrikî guhê rokê êdî rok kete guhê gê. Li hêla din di çîvanokeke gelerî a kurdan de a bi navê "Fatfatokê" yan "taska zêran" hûtên ku morîka xewê di dest wan de ye Fatfatokê direvînin û wê dibin li şikefteke nepen vedişêrin. Li wir wê di xwe re dikin. Jin û kevanî zarok jî jê re çêdibin. Dû re li hev tê û şivanek bi ser şikeftê ve dibe û Fatfatok vedigerîne malê nav dost û hogiran. Piştî ku hût pê dihesin li ser bêhnê wê dişopînin û bi ser malê ve dibin, morîka xewê dixin guhên şêniyên malê û wan dixin temara mirinê. Masiyek di tasekê de heye deng dibe Fatfatokê û dibêje; nigê xwe li tasikê bixîne bila av birije dê sihra hûtan bê birîn.

Kurd heger bixwazin pesnê yekî bidin jê re dibêjin: tu wek morîkekê yî, şana bedewî û ciwaniyê, hevalbiçûka xişir û cewheran. Jixwe gelek terz şêwaz û şiklên morîkan hene ji wan morîka şens û siûdê a bi denên di qalibê dilan de xweşiyê bi ser hilgirê xwe de dirijîne an jî di şiklê ziman de, zimanên dost û neyaran li ber xwe kin û lal dike. Morîka karban a zerbûna wê zerikî ji can û cesedên zarokan dimije wek lempeyekê bi ser nexweşiyê de diheje. Morîka şîr a zarokan wek masiyan di nav golên şîr de wer dike.

Morîka bin zimanê mar a zanîn û marîfetê dide hilgirê xwe, marên ku timî alîkarên mirovan bûn di destan û çîrokên kurdan de, her gava mirov ketibana tengahiyekê an serê pengê li ber wan winda bibana çare û alîkarî ji bal maran dihat. Ev morîka ku zarokan ew di bin zimanê marên xwe de vedişartin û ew dişandin xewnên mezinan, mezinên ku xwestekên wan bi cî nedianîn û dilê wan dihiştin û di şûna ku morîkê bibînin û wê ji xwe re bibin, saw û tirsa maran ew di şeveqan de ji xew û şevbestan hildiçenandin. Û morîka xewê, morîka bêbav û bêdê ya Fatfatokê ew bi şîreta masiyan û bi rijandina comerdiya avê ji hûtan çelpand û ew radestî berketa terikî a destên dêyan kir.

Rojeke payîzê bû. Ji neslê badekên pîrekên dest gulmitkî bû, roka nizim a destbirak û hogir wek pisîkeke gambore simbêlên xwe bi ser me de vediziland. Cara dawî bû pîrka xwe dibînim, ji dêya min re digot: Morîka xewê bigindirîne guhên zarokan law berî giraniya pez bê ser wan. Ji ber ku heger şivanan pez ji çolê vegerand û di axuran de mexel hatin êdî morîk ji destê te diflite û nebedî dibe.

# Kam çira çawişê pisporî şevekneno!


Kamo

Yew kênaya heştês serrîye întîxar kena û rojnameger nê qewimîyayîşî ser xebere virazena û resena belgeyanê destê keyeyê kênaye. La polîs naye ser nê rojnamegere tepişeno û îfadeyê ci gêno. Rastîya xebere nêperseno, delîlanê xebere nêperseno. Derheqê qewimîyayîşî de, seba ke tehqîqat bikero zanayîşan ra nêgêreno û persa winasîye perseno; to çira(qey) na xebere virazte û medyaya sosyale de pare kerde!?.

Derheqê tecawiz û barbarîya leşkeran de ez do qal bika la aye ra ver ez wazena na babete ser bivinda.

Merdim ke hetê hiqûq yan zî bi tarifê qanûnê bingehînî biewno ci ganî wina bibo; yew kênaye întîxar kerda, yew rojnamegere no qewimîyayîşî ser xebere virazta û dest de belgeyî estê. Ewlehîya herême yan zî dozger seba ke tehqîqat bikero nê rojnamegere de têkilîye nano ro û zanayîş yan zî belgeyê ke destê ey de yê ci ra wazeno û bi no qeyde dawa gêno xo dest. La nimûneyê corî musneno ma ke bêhiqûqîye û bêqanûnîye welatê Kurdan de qet nêna nimitene û sazîyê dewlete û kesê ke girêdayîyê sazîyanê dewlete yê bi bêhiqûqîye, bêqanûnîye enê şeveknayene û vera şarê herême hertim enê pawitene. Na mesela mesela ewroyî nîya seserre yo ke no sîstem wina ameyo ramitene.

Hamza Aksût yew cigêrayox û nuştox o û eslê xo de Tirk o. Yew roportaj de derheqê terteleyê Dêrsimî de eynî wina vano: "Ez raştê tayê malûmatan ameya û goreyê nê malûmatan bê leşkeran şaro sivîl zî seba ke qetlîam de ca bigîro û hedkarîya leşkeran bikero şîyo Dêrsim û qirkerdiş de rolê nê milîsan zî şenik nîyo. Terteleyî ra biserran aver derheqê şarê Dêrsimî de raporî ameyê nuştene û nê raporan de - seba ke Elewîyê- derheqê şarê Dêrsimî de çiyê zaf ecêbî ameyê nuştene û bi nê raporan şarê tayê hereman û leşkerî ameyê pirkerdene û qetlê Dêrsimijan ameyo helal kerdene. Leşker û nê milîsan bi nê kîn û qerezî cinî-camêrddoman, xort û azebî bi hewayêko wahşîyane qir kerdê."



Ha kiştena Î.E. bo ha tecawizkarîya Çawişo Pispor Musa Orhanî bo, seserra ke na xete ser bihezaran doliman qewimîyayîşê winasîyî ameyê dîyayene û her dolime zî refleksê dewlete qet nêvurîyo.

Wexto ke quwet û hukmê xo eşkîyo ci maxdurî bêveng verdayê û seba ke newe ra reyna eynî çiyî bikerê verê tecawizkar û nêheqan ameyo akerdene û maxdûrî bi kiştêne û tersî ameyê bêveng kerdene.

Yew hiqûq û yew dewlete bifikirîye ke yew çawişo pispor ê dewlete tecawizê yew kênaye keno û vîst roje rehîn gêno. Bado kênaye gerre kena la çawiş nêno tepiştene û senî ke qet çiyêk nêbîyo şono wezîfeyê xo ser. Kênaye bêçaretîye ra întîxar kena û şar bi zorê xo, medyaya sosyale ser şono qewimîyayîşê ser û çawişê pisporî yê dewlete dano tepiştene.

Yanê dewlete nêwazena çawişî bitepişa û bierza hepis, çunke çiyo ke kerdo seba dewlete zaf tabîî û normal o. Çunke wina perwerde daya ci. Bi mantiqê camerdîye tifang daya dest û vata ganî ma do şarê na herême bîyarê bi çok û hêz û pîrozîya dewlete ci rê bidê qebulkerdene. Bi nê esasan o kerda leşker û herême de wezîfe daya ci.

Kolonyalîstî, her hetê dinyaye de her wext bi eynî metodan şiyê şarê herême ser û welatê ê şarî talan kerdê, cinî û kênayê ê şarî seba ke sey namusê înan dîyê waştê ke bikerê qilêrin û bi no qeyde hem hetê bawerî, hem hetê psîkolojî ra waştê ke şarê herême bîyarê rê çok û hukim û quwet-hêzê şarî çine bikerê.

Tîya de çiyo muhîm refleksê şarî yo. No qewimîyayîş de zî ma dî ke şar ke şoro ser, zexm vindero û peyser ke game nêerzo eşkeno nêheq, zalim û tecawizkaran rê dinya bikero tarî û verê ci bigîro.

Hiqûqê înan, qanûnê înan seba rindî û başîya ma nîyê, hiqûq û qanûnê înan hiqûq û qanûnê kolonyalîzmî yê û sîstemê înan rê xizmetê kenê. Şarê bindestî ancax bi xoverdayîşêko komelkî û wayîrê heqa xo vejîyanêne eşkenê xo bipawê û payan ser o bivindê.

Rastîya ke vejîya meydan wina ya: no qewimîyayîş de, yew eqrebayê yan zî nasê çawişê pisporî ey nêşevekneno, sîstem bi xo, bi destê mahkeme û dozgerî keno ke ey bişevekno.

# Ganî sînorê rexneyan bibo…

Valêre

Nê rojanê peyênan de ez dûrî ra bîya şahidê munaqaşayê çend kesan. Mi gore her merdim layiqê heskerdişî yo û ganî ê ke çewtî kenî zî bi ziwanêk nerm bêrî îqazkerdene. Ez wazena no nuşteyê xo de tay qala nê hedîseyî bikera û ez umid kena ke tay kesî mesajê mi raşt fehm bikerî. Verê ke ez dest bi nuştişê xo bikera, ez wezena vaja ke her çend ma yewbînanî ra ciya bifikirî û ciya bibî zî ez her merdimî hes kena û hurmek nîşanê fikr û şexsê her merdimî dana. Ez rîca kena ke wa tu nîyetêk xirab nêro zerrîya merdiman. Xora wexto ke şima nuşte biwanî şima do fehm bikerî ez wazena se vaja.

Mamoste Roşan Lezgînî (başxirab) xeylê kesî şinasnenî. Raştî zî demanê verênan de xebatanê ercîyayeyan kerdo. Tu merdimêk bê xeta û qusur nêbeno. Herkes xo gore esto û çew kesêk ra zêde nîyo. Mesela wina ya…

Roşan Lezgîn nuşteyêk bi sernameyê 'Demo Peyîn de Rewşa Kirdkî' nuşt û dima ra 'Morceleyê Kirmanckî' de munaqeşe dest pêkerd. Mi zî nuşte wend û sey her kesî mi gore zî nuşte de cayê xeylê raşt û cayê ke bêrî rexnekerdiş estbî. La seke sînorê exlaqî û her çî esto, sînorê rexnekerdişî zî esto. No raştî kesêk nêeşkeno înkar bikero ke Roşan wexto ke kesêk nêeşkayêne derheqê ziwan û kurdîtî de tu çîyêk bikero de xebatanê ercîyayeyan kerdo û keno zî. Ez zaf û zaf baş zana û ez bîya şahid ke kesê ke nika Roşanî rexne kenî tersan ver nêeşkenî vajî welle ma zî estî û tersê dewlete vera nêewtanenê vajî welle ma kurd î. Zazakî beno, kurmancî beno, herçî bi saya têkoşînkerdiş û xebatan ameyo roja ma ya ewro. Wa herkes hema reyêk bifikiro eke têkoşîn nêbayêne halê ma do ewro senî bîyêne.




Ez nêvana Roşan baş vato ya zî xirab vato. Fikrê mi zî helbet esto, la vatişê nê çîyan rî bi rî weş o. Nê vatişî nînê o mana ke ez vatişanê Roşanî tesdîq kena. Wexto ke nuşteyêk yeno wendene fikrê herkesî ciya-ciya beno. Merdim eşkeno her vatişêk ra çîyêk bivejno û vatişêk sero bi rojan munaqeşe bikero. Çîyo ke mi aciz keno oyo ke nê nuşteyî ra dima tay kesî sînoranê rexnekerdişan binpay kerdî. No zî êdî nêbeno rexnekerdiş, beno heqaret. Qaşo ê ke rexne kenî zî wendoxê ma yî û xo aver berdî. Eke kesêk zerrî ra biwazo kêmanîyanê embazêk (Yanî beno ke no kes xerîb zî bibo) bivajo û bi nîyetêk baş nizdî o merdimî bibo, şono rexneyanê xo bi sohbetêk weş rîyê o merdimî de vano û xebatê ke nika bi saya xebatanê verênan yenî kerdene rê çimanê xo nêgêno. Nê kesî demanê zext û tedayan de bibayêne gelo do qala ziwanî bikerdêne? Ma cewabê nê persî têgêrayîşanê ewro ra zanî. Ma kurdî xo nêvînenê û seba sivikfinayîşê kesêk, çi ma dest ra bêro ma kenî.

Ganî merdim munaqeşeyanê girdan de daxî 'exlaq' nêerzo werte. Ganî merdim tay kesan nêkero cayê pêxemberî û çirê înan rê heqaret yeno kerdene nêvajo. Çimkî fikr û ciyayeyî dewlemendîyê ma yî. Beno ke dinya de herkes bimano yewbînan û yew reng bibo? Ya zî beno ke fikrê herkesî yew bibo? Murîdîya di hetan zî tehluke ya. Herkes vatişanê xora mesuldar o. Vatişê winasî 'Bêterbîyetî û dişmenîye çi yo?' weş nîyo. Raştî kesê ke xo rê vanê ma zaf wendî û nê çîyan vanî, şexsîyetê xo nîşan danî. Yanî nê kesî wexto ke grube de nuştî nêvatî gelo na grube de her tewir medim esto. Ganî merdim pesnê zêde ê merdiman nêdo û heqaret bi merdiman zî nêkero. Xeylê vatişê nêweş ê ke ameyî nuştene estî, la ez nêwazena tîya de yew bi yewe vaja.

Rexneyan de yewna çîyêk bala mi ant. Nameyê Roşanî 'no merdim' yeno vatene. Ukalatîyêk winasî û xo cor de vînayîş weş nîyo. 'Ma nê kesî reyde nînê tê het, Ma seyyewbînan nîyê, Ti wendiş nêzanî'. Çîrê Homa to senî viraşto malmîrato. Ganî merdim bizano se vajo û dîqat bikero vatişanê xo. Sohbet û qiseykerdişê di kesan de çi ameyo vatiş nêno zanayene û sewbîna kesêk eleqedar zî nêkeno. La nuştiş benê belge û benê şênberê fikrê merdimî. Coka xebetnayîşê her çekuyêk de baldarî lazim o. Nê çîyî merdiman de dej virazenî. Vatişê mi ê peyên oyo ke ganî rexnekerdişêk bi sînor bibo û çewtî pê çewtî nêno raştkerdene. Herkes seyyewbînan o.

Dewey Ma



Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

# Dortmundî zirar kerd!

Çi eleqey ma Dortmundî ra esto? Dortmund çi yo, çi karî keno? Bêrê ma eyro serê sporî ra bawnê rewşa welatan ra. Nimûnaya ma Dortmund a...

Dortmund klûbey sporî ya alman a. Di lîga pîle ya Almanya "Bundesliga" de kay kena. Namey klûba bi temamî anawo: "Ballspielverein Borussia 09 e.V. Dortmund". Bi kilmî tera vanê Borussia Dortmund, yan zî Dortmund tenî. Serey 1909î de hamiya viraştişî. Ma eşkenê vacê klûba pîle ya diyine a Almanya ya. Bundeslîga de 5 rey biya şampîyone. Tûrnûvayanê miyanê dewletan de zî şampîyoniyê cay estê, zey "Şampiyonê Lîgê Şampiyonan", "Kûpay UEFA" û serkewtinê aneyînî.

Tîma pîle ya Almanya Bayer Munih a. A di Bundesliga de tam 30 rey biya şampîyone ke dimay ay ra Dortmund yena. Dortmund bî çende serî zey emsarî dimay Bayer Munihî ra lîg zey diyin temam kerd.

Spor, bi taybetî zî fûtbol raverşiyayîşê welatan nîşan dano. Mesela welatê tepiya mendê, mesela Iraq, mesela Sûriye, Lubnan, mesela Pakistan, welatanê anayînan de ma fûtbolî nêvînenê. Welatê ke zehf raver şiyê de ma fûtbolêke raver şiyo zî vinenê; xeynî fûtbolê mêrdan, fûtbolê pêrekan zî esto. Mesela tîmê fûtbolî yê neteweyî yê pîrekan, ê Hollanda zî, ê Almanya û Fransa zî estê.

Fûtbol perewo, bi pereyan yeno kaykerdişî. Fûtbol hem hetê çandî ro raverşiyayîşê ê welatî, hem zî hetê aborî ro raverşiyayîşê welatî nîşan dano. Meselaya ma ya eyro zî awa. Loma ma Dortmund zey nimûne nist.

Dortmund ke diyin tîmo pîl ê Almanya wo dimay 10 seran ra, emsar rey joyînan zirar mot ra. Eno 10 serriyo klûbe her pere kar kerdê. Emsar pandemî bandorê xo serê heme welatan de, serê fûtbolî de zî naro û semedê ene joy Dortmundî dimay 10 seran va ke ma emsar zirar kerdo. Tam 44 milyon Euro zirar nîşan da. Klûbe serrêke verê 17.4 milyon Euro kar kerd bî.

Ger klûbêk almane zey Dortmundî zî zirar kerdo se xo ra merdim eşkeno texmîn bikero welatê zey Tirkiya çi rewşe de ya. Yê joyîn ra bigire heta taximo qickek, heme taximê fûtbolî ê Tirkiya nêşkenê binê deynan ra wirzê we. Dewlete bi zor înan serê lingan de gêna. Heta kînga?

Ger ma vacê halê kurdan çi yo? Kurdî eno het de xo ra çiniyê zî. Kurdî bi temamî hema nêşkenê wayîr ro Amed Sporî veciyê. Û Başûrê ma ke bi awayê fermî wayîrê statuyo, ew ca tîmê fûtbolî zî biyê vila, çiniyê.

Erê, bi rehetî ma eşkenê vacê ke welatê raver şiyê fûtbolê cînan xurt o. Rocêke ger zey Barsolenaya Katalanan tîmêkey kurdan viraziyo, dinya de veng bido a çaxî ma go beşkê vacê kurdî zî hem hetê çandî hem zî hetê aborî ro raver şiyê. Marê hema zehf dem lazim o. Her ke meseleya Dortmundiya, ay rê pirsgirêk çiniyo, emsar zirar kerd, serrêna go reyna kar bikero.




# Bizrê xwê

Li Farqînê kana xwê hebû. Gundî diçûn ji kanê xwê dianîn. Rojekê gundiyek diçe ji xwe re xwê tîne û ji **xwediyê kanê re dibêje:**

Ka tu vê xwê ji ku derê tînî?

**Xwediyê kanê:** Ez xwê diçînim!

**Yê gundî:** Tu dikarî hinekî bizrê xwê bidî min jî ku ez jî ji xwe re biçînim

**Xwediyê kanê:** Ser çavan ma ne bi pereyê xwe ye?

Yê gundî qaşo kîsek bizrê xwê dikire û vedigere tê malê. Erdê xwe cot dike û bizrê xwê diçîne lê ji ber ku erdê wî li ber gund bû her roj garana gund di nav erdê wî re diçû û dihat. Xwê, şîn nedibû.

Gundî careke din diçe ku ji xwe re xwê bikire, **xwediyê kanê jê re dibêje:**

Ma te xwê ne çandibû?

**Gundî:** Xwedê ji gavanê gundê me re nehêle. Her roj garana gund di nav erdê min re dibe û tîne. Ew ê çawa xwê hêşin bibe?

**Xwediyê kanê:** Xwedê jê razî, te jî hinekî dûrî gund biçanda.

**Yê gundî:** Heke tu dîsa jî bizrê xwê bidî min ez ê îca dûrî gund li cihekî averê biçînim û ez nahêlim piyê kesî bi wî alî ve here.


**Xwediyê kanê:** Belê ez ê bidim te lê bi şertekî ku tu careke din jî bizir ji min nexwazî.



**Yê gundî dibêje:** Bavo li ser çavan. Yê gundî bizrê xwê tîne û tê gund. Vê carê diçe dûrî gund, li cihekî averê diçîne. Çend roj piştre, baranek dibare û lehî radibe. Yê gundî diçe nav zeviya xwe. Dinihêre ku baranê tiştek di zeviya wî de nehiştiye. Hema di cihê xwe de rûdinê û destê xwe dixe tenişta xwe û dibêje: Erê min niheqî li gavan kiribû loma gavan garan di nav zeviya min re dibir û dianî lê derdê te çi ye ku te guyê xwe di zeviyê de nehîşt.

***Riza Uyar***

## XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Çekeke kevin ku bi kevanê dihate avêtin 3. Koka kurdan û hin gelên din
5. Êl 6. Hal û dirûv 7. Alaveke muzîkê ya kevnar
9. Cihê pûş an jî genim lê tê danîn 12. Ne reş û tarî
14. Notayeke muzîkê 15. Karê ku xwediyê aş dike 17. Tûj
18. Bersiva neyînî 22. Bîranîn, rewşa diyarkirinê, yadname

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Ne hişk, ji bo giyayî
2. Rih 3. Agir
4. Kar û xebat
5. Temen
7. Tiştê ku nexweş dixwe ji bo ku baş bibe 8. Xapandin
10. Ji niha şûn de, îca
11. Çûna hecê ya ne di dema wê de 13. Bawerî 14. Cihê ku film lê tên nîşandan
16. Xemla ku bi stûyê hespan ve dikin 19. Ne bejî
20. Zîl 21. Hûr
23. Conege

**Bersiva hefteya borî**




### Hindik û Rindik

Fewaz Evdê

## Xwedê bide te

Li ba hevalekî xwe -li dikana wî- rûniştî bûm. Parsekek derbas bû. Hevalê min got: Xwedê bide te yabo, xwedê bide te. Yê parsek serê xwe hilda, lê nerî û got: Kuro ku Xwedê bida min, çima ez ê bihatama min ê devê xwe li ber te xwar bikira?!?!



## Ji bo firyalê biteqe

Rojînê bi hevalên xwe re dilîst. Diya wê bi dengekî bilind got: Keçê Rojo, were here ji me re sê kîlo goşt bîne, ji bo em têxin nav tirşikê keça min!! Rojîn bi lez hat û got: Ka pere bide ez herim bînim. Dê got: Hişşş keça min, dengê xwe hilnede, ez ê ji we re makerûnê çêkim. Min ji qestîka wilo got, da deng here cîrana me Firyalê ji bo biqehire û bila ji qehra biteqe.



-Keriyê pez, te çawa dît?
-Keriyê çi?
-Keriyê pez.
-Pezê kê?
-Pezê me.
-Hhhh. Tu henekê xwe dikî?
-Çima gava niha tu hatî, te keriyê pez li ber derî nedît?
-Heram be ku bizineke te jî heye.
-Wekî tu zanî ku bizineke min jî tune, nexwe tu çima bi kevçî mast dixwî!? Te sênîka mast tev bi kevçiyan xwar tu nabêjî dê xelkê malê çi bixwe?



# Neyartiyê li çandê dikin

*NÇM di dîroka kurdan de xwedî cihekî girîng e û wê li dijî zextan serî netewand. Wekî duh, îro jî neyarên çand û hunerê dixwazin xebatên vê saziyê asteng bikin*

Navenda Nûçeyan




Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) di salên ku peyva 'kurd-kurdî' ji binî ve hatibû qedexekirin bi tevlêbûna Apê Mûsa, Îsmaîl Beşîkçî û Feqî Huseyînê Sagnic, li Stenbolê hat damezrandin. Di 27'ê îlona 1991'î de, êdî çanda kurdan û gelên li Rojhilata Navîn di bin sîwana Çanda Mezopotamyayê de dihate parastin. Ji zimanê kurdî heta zimanê din ên di bin çerxa polîtîkayên înkarkirinê de li ber tunebûnê bûn, yek bi yek zindî û geş dibûn û li nav nifşên nû belav dibûn..

NÇM bi armanca pêşîlêgirtina asîmîlasyona li ser çanda kurdan û Rojhilalata Navîn bi salan e li ber xwe dide. Hem ji bo zimanê kurdî hem jî ji bo zimanên etnîk ên li Rojhilata Navîn gelek xebatên ku îro di nav çanda kurdan de wekî xebatên dîrokî tên pênasekirin dan meşandin û hê jî bi vê xeta çandê xebatên xwe dike.

**Gelek hunermend gihandin**

Bi sedan hunermend, stranbêj, şanoger, sînemager li NÇM'ê hatin perwerdekirin. NÇM'ê bi sedan şoreşgerên çanda Mezopotamyayê têgihandin. Em dikarin bêjin ku îro hişmendiya xeta hunereke azad li bakurê Kurdistanê û li tevahiya Tirkiyeyê jî ava kir. Ji Mêrdînê heta Stenbolê, heta Edene, Mêrsîn, Îzmîr û Bursayê jî NÇM'ê bi salan xebatên li ser çand û hunerê kirin.

NÇM ya ev 30 sal in xebatên xwe berdewam dike ji aliyê hişmendiya talanker ve rastî zext û êrîşan tê. Tê zanîn ku hişmendiya serdest her tim çand û hunera gel û komên derveyî xwe tune hesibandine û ji bo ku tune bike jî serî li her cure rê û rêbazên qirêj daye.

Avahiya NÇM'ê ya li navçeya Beyoglû ya Stenbolê ku 18 sal in xebatên çand û hunerê lê dihatin domandin, bi zorê hat valakirin. Tevî ku peymana wê hebû jî di sala 2019'an de bêyî ku navend bê agahdarkirin, ji aliyê Gerînendeya Weqfan ve ji bo avahiya NÇM'ê 3 caran îhale hatibû vekirin. NÇM bi rêyên cuda bi van îhaleyan hesiya û her sê caran jî ket îhaleyan û 2 caran jî qezenc kir lê îhaleyên navendê hatin betalkirin. Niha jî Gerînendeya Weqfan ji bo ku avahiya navendê bide Şaredariya Beyoglûyê ya AKP'î bi zorê navend da valakirin.

## Serlêdanên Akademiya Ma Muzîkê dest pê kir

Serlêdanên Akademiyên Ma Muzîkê yên Akademiya Dengbêjî û Zarokan dest pê kir. Kordînatorê Akademiya Ma Muzîkê Şêrko Kanîwar diyar kir ku ji ku dera welêt dibe bila bibe, herkes dikare serî li akademiyên wan bide.

Şêrko Kanîwar ji Ajansa Mezopotamyayê (MA) re axivî û diyar kir ku piştî di 15'ê cotmehê de serlêdan bi dawî bibin, dê ji nav kesên serlêdan kirine, ji bo her sê akademiyan kesan hilbijêrin. Kanîwar, qala naveroka dersên akademiyan kir û ev tişt got: "Di Akademiya Zarokan de sala yekemîn dersên stranbêjiyê, çanda dengbêjiyê, rîtîm û zimanê kurdî hene. Zarok dê şeş salan perwerdeya zimanê kurdî bibînin. Mixabin gelek zarokên ku tên akademiyê bi kurdî nizanin. Bi rêya Akademiya Zarokan ew zarok dê hem zimanê xwe hem jî çanda xwe fêr bibin. Salên din jî perwerdeya teoriya muzîkê, piyanoyê lê zêde dibe. Ji sala 2'yan û şûnde her zarok dikare enstrumanekê hilbijêre û akademiya xwe 6 salan berdewam bike." **AMED**




## Ji Weşanên Aryenê 2 pirtûkên nû

Weşanên Aryen, bi 2 pirtûkên nû derkete pêşberî xwendevanan.

Weşanxaneya ku bi gelemperî xebatên girtiyên siyasî digire dest û di navbera girtîgeh û xwendevanan de pireke ji wêjeyê ava dike, pirtûka çîrokan a nivîskara bi nav û deng Asli Erdogan "Avahiya Kevirî û Ên Din" wergerand kurdî û çap kir. Wergera pirtûkê ji hêlâ Erd Agron ve ku ew bixwe jî zêdetirî 20 sal in di girtîgehê de ye û bi pirtûka xwe ya "Dîwana Hestiyan" tê nasîn hate kirin. Pirtûka din a weşanxaneyê çap kir jî romana Mahmut Yamalak a bi navê "Rêwingî" ye. Romana ku ji 338 rûpelan pêk tê, romana Yamalak a 3'yemîn e. **AMED**






Weswese 2

**Şener Ozmen**

## Tiştekî nû nabêjin

Di salên 60î de ji ji ber ku peyvên wek *"Kurd"* û *"Kurdistan"* qedexe bûn, li şûna Kurd peyva *"Doğulu"* ango *Rojhilatî* û li şûna *"Kurdistan"* ê jî peyva Doğu ango Rojhilat bi kar dianîn. Serboriya hunera hevçax a Kurdan jî fena serboriya *Koma Rojhilatiyan* (Doğulular Grubu) ya di TÎPê (Partiya Karkerên Tirkiyeyê) de ye, ku ji xeynî çend kesên ji eslê xwe ne Kurd, piranî ji Kurdan dihat pê. Bi tevî ku Di TÎPê de yekîtiyeke siyasî û birdoziyê tune bû jî, partiyê di hilbijartinên sala 1965an de 15 wekîl derêxistibû; *M. Ali Aybar* û *Çetin Altan* ji Stenbolê, 13 wekîl jî ji *Mayîya Netewî* –Milli Bakiye– hatibûn hilbijartin ku exlebê wan Kurd bûn û ji bajarên wek *Qers*, *Meletî*, *Eyntab*, *Amed* û *Rihayê* derketibûn. Ji lewre, giraniya Kurdan, piştî vê hilbijartinê zêdetir bûbû. TÎP ji pevgihaniya sê komên sereke; *Sendîkacılar* (Sendîkavan), *Emek Grubu* (Koma Kedê yan jî Koma Aren û Boranê) û *Doğulular Grubu* (Koma Rojhilatiyan, ango Koma Kurdan) hatibû pê. Badilhewa nîn bû, lewre TÎP (Partiya Karkerên Tirkiyeyê), ji aliyê Sendîkavanan ve hatibû damezrandin û Sendîkavan jî, li ser vê esasê, dixwestin ku di rêvebeRiyê de bêhtir bibin xwedî gotin. Koma Rojhilatiyan, di Duyemîn Kongreya TÎPê de (di sala 1966î de) ku li Meletiyê li dar ketibû, li gorî hin çavkaniyan 'jixweber' derketibû mexderê; lewre di Kongreya Duyemîn de yekem car qaqiboya birdoziyê jî rû dabû; Aybar, di 12ê Gulana 1963yan de li Eyntabê, di civîna Desteya Rêveberiya Gelemperî de li pêşberî gel peyivîbû; *"Pirsgirekeke me ya din a mezin heye: Li bajarên me yên Rojhilat û Başurê Rojhilatê bi milyonan welatiyên me hene ku piranî bi Kurdî û Erebî dipeyivin, her wiha ji mezheba Elewîyan jî…"*, ji devê serokekî giştî yekem car gotinên wehakî derketibûn û Kurd ji Aybarî hez dikirin, diltenik bûn, loma jî, li hemberî layengirên MDDyê (Şoreşa Netewî Demokratîk) bêyî ku têkevin dûdiliyê, rawestiyan.

Di Mêjûya Partiyên Siyasî de –mebest ji vê Tirkiye ye– şoreşa herî mezin, heye ku biryara *Komîsyona Pêşnûmaya Gel* bû ya ku pêşkêşî Kongreya Çaremîn (29-31 Cotmeh 1970, Enqere) a TÎPê kiribûn; li gorî vê biryarê *"…li Rojhilatê Tirkiyeyê Kurd hebûn û ji destpêkê ve di bin zilma çînên serdest û desthilatdariyên faşîst de bûn"*, kurt û Kurmancî TÎP, ji aliyê pêdiviyên têkoşîna şoreşa sosyalîst a çîna karkeran ve ranêzîkî "Pirsgirêka Kurdan" bûbû, piştî pevçûnineke dûredirêj, pirsgirêk pejirandibû û pê re pê re biryar ragihandibû tevahiya Tirkiyeyê û cîhana sosyalîst. Vê yekê, vê ked û kespê, vê têkoşînê(!) ji hêlekê ve –min bibexşînin– dişibînim serboriya hunera hevçax a Kurdan a navend Tirkiye, tenê cudahiyek heye, Kurdên îro, pariyekî din bûne Tirk, ne bes ji bo bi Kurdî napeyivin, nexêr, wek aqil jî, heckû kêmtir in û di geremola hevpeyvînan de digevizin. Hingê pirsek tê ji kûrahiya ku aqil li wir kamil dibe; *"Derdê we çi ye? Heke hûn ne Kurd bin, nexwe hûn çi ne?"*

1960-2020, ne TÎP maye, ne jî *Koma Rojhilatiyan* (Doğulular Grubu), ne *Aren* û ne *Boran*, ne jî sendîkavanekî ku dest bavêje van kar û barên hunerî… Ma gelo hunera hevçax bi rêberiya sendîkavanan dimeşe? Helbet ev ne pêkan e, lêbelê bi vîzyonê, pêkan e, pêkan e ku sibêroj *Komeleya Rexnegirên Hunerî Ya Kurdistanê* jî ava bibe û hin tiştên din jî. Loma giring in xeyal, heke bi per û bask bin.

Herçî nifşê me bû, bi min em hatin cûtin, TÎPê peyva Kurd pejirandibû, yên îro, bi tevî ku di ser çalakiyên çand û hunerê pêwendiyên xwe bi cografyaya Kurdan re û bi hunermendên wan re geştir kiribin jî, antîpatiya wan a li hemberî vê peyvê di nav salan re zêdetir û bêperwatir bûye, heya roja îro jî min tu hunermendeke/î hevçax ya/yê Tirk (di heman demê de kurator û galerîst û rexnegirê hunerê) nedît ku bibêje; "Hûn mafdar in…", evqas, ne tiştekî din! Hûn Kurd bin jî, hûn dijber bin jî, hunera we jixweber dibe hunera wan, çi ku we pêdivî bi pergalekê heye û ew jî, çawan bibêjim, mixabin di destê wan de ye. Lêbelê ez yên ku tewqa xwe ji welatê wan –her wiha ji mêjûya wan ya hunerî– birrîne û çûne welatên dereke, fam nakim, tênagihîm weki çawan piştî ewqas zilm û zordariyê, dîsan bi Tirkiyeke şikestî hewl didin ku hunera xwe –ku ew her çi be– kat bikin, ji kî re? Helbet ji mêjûya wan ya hunerî re!

Di sala 1997an de gava enstelasyona me ya hevpar di rûpela Çand û Hunerê ya Rojnameya Demokrasiyê de wek nûçeya sereke hatibû weşandin, per tune bû ku em pê bifirin, lêbelê ev dom nekir, hingê Çapemeniya Kurdan guh nedida hunera hevçax, wan jî fena çepgirên Tirk, hunera hevçax weke anomaliyekê (yan jî wek fen û fûtên kapîtalîzmê) didîtin, ya rast, derheqê vê meselê de fikrekî wan tune bû.

Eynî wek giligotinên Cengiz Gündoğduyî ku derheqê nivîskariya Orhan Pamukî de digot, hingê em di heman çalakiyê de *(Çalakiyên Payîzê Yên Zanîngeha Azad, 2013, ku ez mêvanê Fikret Başkayayî bûm)* hatibûn ba hev û mafê axaftinê yê êwil dabûn wî û li gorî Gündoğduyî, jixwe Pamuk ne nivîskar bû jî! Pirsgirêka Rojhilatiyê careke din hatibû ber min; TÎP çîbû, belam TÎPÎTÎP hatibûn û ketibûn şûnê; pêşengeha li Proje4Lyê (Stenbol, 2003) jî di çapemeniyê de li ser têgeha *"Doğulular"* (Yên Rojhilatî) hatibû ava kirin; *"Doğulu 37 gencecik sanatçımızın…"*, (Meral Tamer, Milliyet), *"Doğu ve Güneydoğulu otuz yedi genç sanatçı…"* (Akşam), *"Türkiye'nin çeşitli bölgelerinden yenilikçi ve muhalif"* (Müge Mengü, Light Forum)… *"Sanatta Kürt ve gay olmak moda…"* (Xwediya van gotinan jî hûn peyda bikin).

Nexêr, na, tiştekî nû nabêjin, dê nebêjin jî!

*"Heya van salên nêzîk dîroka hunerê, xasma jî dîroka edebiyatê ne zanistek lêbelê hevpeyvînek bû."*

Bingo!

Roman Jakobson van gotinan di nivîsa xwe ya bi navê Di Hunerê De Li Ser Rasteqîneyê de dibêje ku ji aliyê Mehmet Rifat-Sema Rifat ve hatiye wergerandin û wek 'Heşt Nivîs'ên Roman Jakobsonî jî di sala 1990î de çap bûye. Çunkî dibêje di dewama nivîsê de Jakobson, *"Li hemû zagonên hevpeyvînê dihat…"*

*'Zagonên hevpeyvînê'*, binê vê gotinê jî xêz dikim, camêr pê re pê re çibûna hevpeyvînê jî penase dike; *"Hevpeyvîn wek singê nav kayê ye, li ser avdestekê nasekine, bi dû gotinên bicoşûperoş re yên ku bi zerafeteke dirûvî dest pê dikirin, çîrokên piçûk yên jî jiyana hunermend hatine wergirtin, dihatin."* Termên vebirî (mutleq) yên hevpeyvînê nîn in, berevajî, curbicuriya terman, peyvên bêwate yên ku rê li ber deq û dolabên gotinî vedikin, çawaniyên ku balrakêşiyekê didin axaftinê… Li vir divê binê 'peyvên bêwate' jî xêz bikim, lewre di gelek hevpeyvînan de tişta ku rastî wê têm ev e; çawan dikarin giligotinên evqas 'bêwate' û bi ser de jî pelepûç bînin ba hev!?

Tirkbûna we li we pîroz be!

Spas, lê ez ê venexwim!



Sanat 9

PLASTİK SANATLAR

# 1996'nın penceresinden

SERGİLER

# xwebûn

24-30 Tebax 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 36

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*
Kadri Esen
*Sorumlu Yazışleri Müdürü:*
İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:*
Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli

*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mah. Gevran Cad.
Akkoyunlu No: 5/13
*Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin
Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı
Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85


# Dêra Metînayê, eşîra metînî; Mîtanî


Keştiya Alalû
**Agît Yazar**




Foto: Zerdeşt Cemal

Amed, nola axtapoteke dêwasa ku li ser hêkên xwe kurketîbe, a wanî li ser nîvê nexşeya welat mexel hatiye û bi her heyşt milê xwe çar hawirdorê welêt, bi efidandina dayikane rapêçaye. Û em jî her carê didin ser milekî Ameda qedîm û nola şopajoyekî şareza, şopên pêşiyên xwe dajon. Di destpêkê de heta em bi ser şopa pêşiyên xwe yên qedîm ve dibin, em hinekî mişhet dibin lê piştî demekê êdî meriv lê biste dibe û mîna avê meriv pê de diçe. Gava çavên te bifesilin li ser şopên pêşiyên kurdan, êdî di nav hezaran şopên ji hev cuda de bin jî, tu bi hêsanî dikarî şopên pêşiyên kurdan kifş bikî. Ti şop, bi qasî şopên pêşiyên me, ew çend ne pak û paqij in. Xwedêyo! Em çiqas şopajoyên bisiûd û serbilind in.

Dîsa wekî her carê, em ji gewdê axtapot, ango em ji Amedê didin rê û em şopên dîrokî yên tozgirtî hildajon. Milê axtepota me, vê carê ber bi dêra Metînayê ve dirêj kiriye. Qirçeqirça kela havînê ye. Li vî alî û li wî aliyê me, zeviyên hatine dirûn, yên li ber dirûnê û beyarên li ber tava havînê birajtî, yek bi yek em li dû xwe dihêlin û em di ser çiyayê aqibê, sê pirko û pira xanê re derbas dibin. Ê de bila ji xêra xwedê re ev her sê deverên ku min navên wan bi lêv kirin, zimanek têketa devê wan û serpêhatiyên xwe bikêlimiyan. Li ser milê rastê, ji dûr ve gundê Dawidiyê bi melûlî dixuyê. Ev gundê hanê, yên kurdên êzidî yên bi esil û fesil bû lê ji hêla kurdên hevalbendên DAIŞ'ê ve hatiye wêrankirin. Gewdeyê min ji ber xwe ve li hemberî gundê Dawidiyê dikeve rewşa dîrozeke dem û dewranên qedîm. Mûyên li canê min bûne sîx, her yek ji xwe re dîrozeke êzidiyanî dikêlime.

Piştî pira Xanê, em di ber Mîrhesin û banê Gewrê re derbas dibin. Ziyareta Kopek-qeranê derdikeve pêşberî me. Ji navê xwe jî eyan dibe ku di wextekê de kurdan li vê derê ji bo kopekekî qirr li hevdu anînin û malik li hevdu virritandine. Ji Kopek-qeranê û ber bi hêla Qerejdaxê ve, lûleya dîrokî a Bircikê, nola dêwekî reş di nav kevirên volqanîk de dixuyê. Ji rewşa vê birca ku bi kevirên dêwasa hatiye lêkirin diyar dibe ku ji hêla Bîzansiyan ve, bi mebesta garnîzyoneke leşkerî hatiye lêkirin lê ev birc û garnîzyon, nîvçe maye û nehatiye temamkirin. Ev kevirên volqanîk jî, di demeke gelekî kevn de, çaxa Qerejdax verişyaye, ev helanê agirî nola çemekî sor î kurr, ber bi hêla rojhilat ve herikiye. Di ser gundê Qoryê, Qubik, Gurco û Tilwerê re fitiliye, berê xwe daye hêla başûr û di navbera gundê Bîrabazin û Qurmê Şewitî re derbas dibe diçe heta gundê Birikê, Wêrtewiran û heta nêzî gola Gulê jî diçe.

Ev herêma ku ez qalê dikim, herêma ku zarokatiya min lê derbas bûye. Ev riya em aniha tê de dimeşim jî, ka xwedê zane bê min çiqas car xwe li ser devê vê rêyê daye li benda bajarvaniyên ku bêhna nanê Amedê, helawa Mêrdînê û şekirê qulqulî jê dihat. Li jêra gundê Bîrabazin, cendermeyan rê girtibû, nedihişt ti kes dagere nav gund. Ez miraq dikim û ez ji nasekî re li telefonê dixînim. Ew nas dibêje, şêxê wan hatiye tev li xwarina mewlûdê bûye û murîdên xwe tevdek bi şewba koronayê xistine.

Heke ne ji qurmiçiyê şêx bûya, em ê dageriyana nav gund û me yê silavek bida xizim û nasên xwe. Bi vî awayî em di ber goristana Bîrabazinê re derbas dibin. Aramgeha mavê min Mele Dawid jî di nav vê goristanê de ye. Ez bala xwe didim goristanê, ez dinêrim ku ne wek berê ye. Dora goristanê bi têlên rêsayî hatiye dorpêçkirin. Ev yeka hanê kêfa min tîne. Lewra dilê min tê ber min ku êdî terşên serberadayî ew ê nema bikaribin derkevin li ser kevçika dilên miriyên me. Ez dîrozeke Zerdeştiyan e ji bavo û cimata li dora wî re dixwînim û em lêdixin yekser berê xwe didin dêra Metînayê.

**Serdema Bîzansiyan**

Diyar e ku di wextekê de xelkê ermen jî, di gundê dêra Metînayê de bi cih bûye. Nexasim çaxa împaratoriya Bîzansî derbasî ola xiristiyaniyê dibe, hingê Bîzansî destegeke muazam dide gelê ermen. Lewra miletê ermen û asûr-suryan, beriya her miletî ola xiristiyaniyê dipejirînin. Piştî zayînê di sala 312'an de, çaxa Amerîkaya hingê, ango împeratoriya Bîzansê jî ola xiristiyaniyê dipejirîne, êdî gelê ermen li herêmê nola werma mar bi pêş dikevin. Loma li her deverê, dêr û mabedên olî ava dikin. Dêrek ji wan dêran jî, dêra Metînayê ye lê ne navekî ermenî, navê eşîra Metînayê li heman dêrê dikin û dibêjin dêra Metîna. Wekî tê zanîn jî, eşîra Metînayê, navê xwe ji hikumdariya pêşiyê kurdan, Mîtaniyan wergirtiye. Dîroka dewleta Mîtaniyan jî, têêê xwe dispêre 3700 sal beriya niha.

Ez bi xwe di sala 1973'an de li vî gundî, ango li gundê dêra Metînayê hatime dinyayê. Çaxa ez zarok bûm, hema hewka tê bîra min. Lûleyek zinc î reş, heta li ber kokevaniya ezmanan di asoya min de bilind dibû. Di jiyana min a şexsî de, ev lûleya dêra Metînayê, xwediyê risteke gelekî mezin e ku ez a niha ketime li dû şopên pêşiyên xwe û virde wêde li nav kavilên dîrokê digerim.

Hesteke gelekî xerîb e. Piştî ewqas sal ez diçim dêra Metîna û ti kes ji wî gundî min nas nake. Çaxa em li dora lûla dêra Metînayê digerin, em bala xwe didinê ku qismekî wan avahiyên dîrokî kirine axurên pez, qismek kirine tewla ker û hespan. Dêra dîrokî jî kirine kadîna kayê. Ez deriyekî berrabotî li ber avahiyekê dibînim. Çaxa ez wî derî vedikim, kûçikekî ku ji ber şêzan reviyabû û xwe avêtibû hundirê wê avahiyê, hema ji nişka ve xwe davêje ser çavê min. Ji tirsa kûçikê no û xulqteng, min li hundirê wê avahiyê saxtî nekir ka ew der çi tişt e. Li vegerê ez zikamekî li ber devê kadînê dibînim. Hin tişt mişt ji kadînê derdixistin. Kalemêr dibêje: "Heke ne bi xêra me bûya û me ev avahiyên tarîxî nekirana axur û kadîn, ka xwedê zane bê ew ê çi bihata serê van avahiyana. Niha kevirek jî li dewsê nemabû!" Tu nedizanî bikene yan jî bigirî.

Ez careke din li dora lûlê doş dibim û ez dibînim ku kalemêrek li ser banê xaniyê li hember, bi baldarî me dişopîne. Diranê wî yên zêr, nola sotikê êr di nav lêvên wî re dixuye. Diranên bavo jî ên zêrîn bûn. Ez zorê didim bîra xwe. Belê ez dibêjim hebe tinebe ev apê Mehemed e. Bi nenasî ez rojbixêrekê didim apê Mehemed. Ew jî rojbixêrê li me vedigerîne, xwe ji ser banê xênî berdide xwarê û tê gel me. Bi qasî dirêjahiya derbendekê em navbênê di navbera xwe de dihêlin û dîsa bi nenasî ez pirsan ji apê Mehemd dipirsim û mîqrefonê dirêjî wî dikim. Apê Mehemed jî wiha dibêje: "Dêra Metîna başkenta (paytext) eşîra Metîna ye. Tam 48 gundê me hene. Milet ji gundan bêtir li bajêr belav bûne. Berê, me ji xwe re li hevdu guhdarî dikir. Niha herkes ji xwe re dibêjin ez axa me. Dêra Metîna başkenta eşîra Metîna ye!..."

Apê Mehemed bi gazin bû. Çaxa destê xwe nola melêveke darînî virde wêde dirêj dikir, ji işareta destê wî dihat fêmkirin ku ev her 48 gundê eşîra Metîna, di sê kuçikiya Şemrix, Riya Hevirmêş a di qîr û çiyayê Qerejdaxê de ne. Her wiha gundê Dêra Metînayê jî, tam di nîvê vê sêkuçikiyê de, li serê girekî ye. Ez di dilê xwe de dibêjim, bavo wele paytexta eşîrê li gundê we tê. Ê ji xwe ev herêma hanê, navenda dewleta Mîtanî jî bûye. Mirovekî ji meşê re jêhatî, di nav rojekê de bi meş dikane ji dêra Metîna biçe heta Waşûkanî (Serêkaniyê) ya paytexta dewleta Mîtaniyan.

Çaxa ez xwe bi apê Mehemed didim nasîn, hema hew bask lênakeve û nafire. Apê Mehemed dide pêşiya min û dixwaze tiştekî raberî min bike. Em dikevin hindurê hewşekê. Apê Mehemed xaniyekî kevn şanî min dide û ji min re dibêje, "binêre, qenc bala xwe bidê birazê! Tu aha di vê malê de hatiyî dinyayê!"

Ew xanî ji kevirên lihevhatî hatibû avakirin û ji hêla dîtbariya xwe ve, ew jî têra xwe dîrokî dixuya. Mal, hema 50 metreyekî dikeve rojavayê lûla dêrê. Ez li ber devê wê malê li lûla dêrê dinêrim û ez diçim zarokatiya xwe. Lûla dêra Metîna, di asoya min de bilind dibe derdikeve heta li ber kokevaniya ezmanê şîn ê lacîwert.

Apê Mehemed çiqas israr dike jî, lê ji ber tirsa dibe ku em hilgirê pandemiyê bin, em naçin li ser sifra apê Mehemed rûnanên. Em xatirên xwe ji apê Mehemed û sêra Metînayê dixwazin û em berê xwe didin kela Rebetê.

Dengê apê Mehemed li dû me tê, dibêje; "Hela binêrin lawo ev çi zeman e! Lawê birakê min Mele Dawid tê gundê min û ez nikaribin wî biezimînim. Hela binêrin lawo ma ev çi zeman e!"

## Dêra Metînayê

Wer tê zanîn ku kele û lûleya dîrokî a dêra Metînayê, di serdema Bîzansiyan de hatiye çêkirin. Ango li derdora 1700 sal berê hatiye avakirin lê dîroka vî gundî, ji serdema Bîzansiyan jî kevntir e. Dêra Metînayê, 33 km dikeve başûr-rojavayê Şemrixa Mêrdînê û li ser girikekî hatiye avakirin. Ew girik jî serdanpê ji kevirekî xişik pêk tê. Ev kevirê xişik, quluk qulikî ye û dema tu kevir davêjî nav avê, kevir li ser avê dimîne. Di herêmê de gelek girikên wanî volqanîk hene û ev kevirê hanê, meya çîmento ye. Li gundê Musûriyê bi ser Dêrika Çiyayê Mazî ve jî, girekî wanî ku serdanpê ji heman xişikî heye û mahdenê vî girikî di destê malbateke ji heman gudî de ye. Her wiha, li gorî aboriya herêmê ranteke dêwasa di xwe de dihewîne.

